


WELAT



Röpel 3

Hepveyîn bi Konê Reş re

Rojnamegeriya kurdî
bi paş de vedigere

Röpel 4

Hepveyîn bi Koma Rojhilat re

Gotin û meqamên muzîka
kurdî jî hev nabin

Röpel 8-9

Dildar Şekc

Elbestvanekî xemgîn û
dilgerm Xemgînê Remo

Röpel 10



Metin Aksoy: Ji nû ve Koma Amed

7



M. Agirî: Generalê Teneke

11



Zana Farqînî: Li ser wergera 'Biyanî' ya Camus

13

Ji Xwendevan

Ez naxwazim di Azadiya Welat de mijara rexneyan vebe. Ez dibêjim çiqas niviskarêne me hene pêwest e derd û kulên gelê bindest bînin ziman, ne ku hev û din rexne bikin.

Dema ku hev rexne dîkin hestiyê min yê ku ev hezar sal e bindist e direcîfe. İro ne roja rexnekirinê ye. Ez dikarim mînakeke wiha bidim: Di pirtükên tîrkan de, di rojnameyên wan de û di axastinên wan de bêjeyên (peyvîn) erebî, farîsi gelek in. Lî belê dewlet û saziyên wan, rojnameyên wan azad in, azad dipeyi-vin, tiştek nabe. Mînak: Misal, mehkeme adîye, hakim, mektep, durbin, nankor-luk hwd.

Ez, dibêjim çawa ku serokê diyana-tîrkan der barê bûyera Susurlukê de wiha gotibû: "Wê mijarê tevnedin, tişte-pêwest yekbûn e, li ser-neaxtîvin, bigerin."

Em hêj nehatine wê merheleyê ku em hev û din binirxîn. Dîvî em pêsi per-werde bibin û bi pêg bikevin. Dema bîr û bâweriya me tim û tim jî bo avakirina welat be, em hingê dikarin hev û din binirxîn û çewteyên havalen xwe binin zinan.

Dema ku endamên parlmentoya tîrkan bi qirika hev digirin, mirov dibêje-qey dijminê hev in. Lî belê me (kurdan) dixapîtin. Yekitiya wan hezar sal e belav nebiye.

MELE DILBİXWÎN



Îcar bi xatirê we

MEHMET GEMSİZ

Me di vî quncikî de bi nivîsa "Hêvî Nemir e", silav dabû we xwendevanê hêja. Îcar çaxê xatirxwestinê jî hat.

Gêrcî ev xatirxwestin ne bi vîn û hemdê me ye. Qanûnê Roma Reş a çewsîner rî li ber me digirin. Ew dibe sedem ku em erk û vatiniya xwe bispêrin hevalekî din.

Me bi sernavê "Hêvî nayê kuştin" hejmara xwe ya pêşin a Azadiya Welat derxistibû, lê beriya wê Welatê Me û pêsiya wê jî Welat hebû.

Ligel cezakirin û astengan 115 hejmaren Welat gihan xwîneren (xwendevanê) zimanê kurdi. Pişti ku ew nema derket, Welatê Me da ser şop û rîça wê. Ew jî tene karibû 46 hejmar derketa.

Me heta hejmara 10'an Berpirsiya Karênen Nivîsaran ê Welatê Me kir. Ji ber nivîsîn di hejmare wê yên 4,5 û 6'an de doz li me hatin vekirin. Doza du hejmaren wê (5 û 6'an) zûde gihabûn encamê û hem cezayê hepsê û hem jî yê pereyan li me hetibû birin. Niha biryara dadgehê, li

Dadgeha Bilind li hêviya pesend (tesdiq) kirinê ye.

Doza ji ber nivîsîn di hejmara 4'an de jî hîna li Dodgeha Ewletiyê ya Dewletê ya Stenbolê (İDGM) didome.

Lewma em ji ber van egeran ji Gerînendetîya Giştî ya Weşanê vedikişin.

Ji ber ku em xwediyê bawerî û hêviyekî ne û ji bo pêkanîna wan jî em çavên xwe ji tiştekî naniqînîn, me navê sernavê rojnameyê wisa danibû, yanê "Hêvî nayê kuştin." Hem jî derketina me rastî salvege-ra 50. a Komara Kurdistanê ya Mehabadê hatibû. Ev jî rasthatineke geleki xweş bû û pir li hev kiribûn.

Me neda dû gotina "zimano bîriyo, serîyo seqiriyo." Me ya din ji xwe re bijart: "Zimano leq û leq, serîyo teq û req."

Karê me ne "leqleqkirin" e, bila şas neyê fêmkirin, em gotina rastiyen ji hebûna qanûnan girîngit dîbîn. Me bi dilê xwe ev warê têkoşînê ji xwe re guncan (muna-sîp) dît û serbilindî ji me re bû şîarek.

Di vê riyê de gelek hempîseyen me se-

rê xwe danîn ser axa sar. Rewşa me, li ba ya wan ne tiştek e.

Neyar neyar e, gazinc jê nabe. Ew lê dixeble ku bi gelek rî dirban me berte-raf bike, roniyan bitemire, qeleman bîşkêne.

Em tenê wezîfeya xwe ya bi rûmet û pîroz dispêrin hevalen xwe. Ne ku em dev ji xebata di vî warî de berdin. Heta em zindî bin li darê dînyayê û em ev bin jêveger nîn e.

Em hêviya xwe dişibînîn giyayê karûs û firêzê, ew çiqas bêñ çinîn jî dîsa şîn di-be, ji kokan jî bêñ hilkişandin û avêtîn dîsa şîn têñ. Çimkî ew nemir in, eynî wekî hêvî û doza me...

Bi gotinê Apê Mûsa, pîrê pîsaya me, me dest bi nivîsa xwe ya yekemîn kiribû. Dîsa bi gotinê wî me divê, em dawî li ni-vîsa xwe bîn. A di vî quncikî de. Ji niyîsa wî ya bi navê "Çinara Min" (Welat, hej-mar 3, r. 13, 1992)

"Dibîn berê di yewnana qedim-de lis-kek wan hebû, agir pêdixistin xort dibeziyan, xortekî agir dida dest yê din. Bi vî ha-wî bi hezaran xortan ew çira didan dest hev heta bighana akrepola armanca xwe. İşe miletan, jî wiha ye. Yek nikare ji cihê cih meşala xwe bigihine Akreolê, divê mirov bidin dest hev..."

Azadiya Welat û xwendevan

CİGERSOT-BOTANİ

Wekî tê zanîn ku bi sed salan e ku axîn û keserên me na-çe tu gelîyan. Ji ber ku azadiya me, zimanê me, çanda me, kesaniya me heta hemû ma-fen jiyanê li me hatine qedexekirin. Bi kurtahî neyaren me em bi saxî kirine gorê...

Belê gelê me xort û keçikên wî yên çelenk ev reşa hanê ya tunekirinê qe-bûl neyarin. Di van bîst salen dawîn de têkoşîneke hemdemî li hemberî neyar tete dayîn. Ev têkoşîn bi tenê ya azadi-yê ye, ji aliyeke ve têkoşîna ji nû ve hatina dinê ye, ji aliye din ve ji têkoşîna paqijkirina mirovahiyê ye...

Di vê têkoşînê de civakâ kurd ji ri-zînê tête paqijkirin û ji nû ye tête damezrandin.

Ji ramanê heta çandê, ji dîrokê heta bîrdoziyê, ji kesaniyê heta hunerê û ziman her tiş ji nûv e tête vejiyan-din... Ji ber vê yekê mirov dikare bêje gelê kurd ketiye nava pêvajoyeke dîrokî û girîng... Ev qonaxa hebûn û tune-bûnê ye. Ji ber vê yekê her mirovekê kurd ku xwe bixîret dihesibîne, xwe mirov û welatparêz dibîne divê di vê dema dîrokî de rista xwe (rola) xwe bileyize.

Ev pêvajoya em têde ew dem e ku em ji nû ve li hemû mafen xwe ên ci-

Ne gelek dûr, wextê li bîra xwe bînîn çend sal berê me hemûyan digot axx xwaziya li wê rojê ku ew roja me bi zimanê xwe bi karibûya bixwînîn, binivîstin, an ji me televîzyonek, radyoyek hebûya, bi zimanê me ji me xeber bidaya.

Belê, gelê me û egîdîn wî bi mîrxaşî û bêminetî xwîna xwe rijandin û berdelêن giran dan, ev mafen hêja bi destê xwe xis-tin. Lî mixabin pir mixabin gelek mirovîn me hêj ev bûyer, ev hêjahiya anê fêm nekiriye.

vakî xwedî derkevin û nûjen bikin.

Ne gelek dûr, wextê li bîra xwe bînîn çend sal berê me hemûyan digot axx xwaziya li wê rojê ku ew roja me bi zimanê xwe bi karibûya bixwînîn, binivîstin, an ji me televîzyonek, radyoyek hebûya, bi zimanê me ji me xeber bidaya.

Belê, gelê me û egîdîn wî bi mîrxaşî û bêminetî xwîna xwe rijandin û berdelên giran dan, ev mafen hêja bi destê xwe xis-tin.

Lî belê mixabin pir mixabin gélek mirovîn me hêj ev bûyer, ev hêjahiya hanê fêm nekiriye. Em, bi xem dibîn ku ên ji xwe re dibêjîn em ronak-bîr in, em welatparêz in, û xwendevan in; bi piranî ne rojnameya Azadiya Welat, ne jî berhem û pirtükîn ku bi zimanê kurdi têne nivîsandin û amadekirin, dixwînîn.

Tuyê bibêjî qey ev kovar, kitêb, roj-name û hwd. ne jî bo vî geli têne ama-

dekirin. Mirov li vir matmayî dimîne. Gelo ev bêxemiya henê ci ye, ji bo ci ye? Bi rastî tiştekî pir ecêb e.. Xwîna bi hezaran insanen me tete rijandin. berdelên giranbuha tene dayin, heta ev berhem tene amadekirin û pêkanîn. Lî insanen me xwe naxînin zahmete û van berhem an naxwînîn.

Belê em dizanîn ku ev rewş êşa he-zar salî ye, neyare me bi zanîn em xis-tine kesayetiyeke wilo ecêb. Lî belê ev nayete ve wateyê ku em bêjine; ev xweş hal e û bila wisa bimeşe. Na na-be.

Bang li hemû insanen me yên ku xwe mirov dihesibîn, çawa em rojekê bênan û av naqedinîn û xwe nahêlin birçî, divê wisa jî em li li nirx û ber-hemîn xwe xwedî derkevin. Sarpişka hemûyan rojnameya Azadiya Welat, divê em bixwînîn, bidin xwendevan û bi-bine nivîskarê wê. Ev deynê stûyê me hemûyan e.

SALVEGERA bombekirina rojnameya Özgür Ülke'ye ji aliyê Yekiliya Çapemeniyê ya Neteweyî ve hate şermezarkirin. Xwediye Özgür Ülke Hasan Keüükoba je bo dorfirehkirina lêpîrsînê serî li dozgeriya komarî da. Wekî tê zanîn Özgür Ülke roja 3'ye Berfanbara 1994'an bi ferma Tansu Çillerê hatibû bombekirin. Çapemeniyê tirk a ku li dijî sansûrkirina çapemeniyê kampanyayan li dar dixe, bi kurtençeyan li ser van bûyeran rawestîya û pîrî caran ji navê rojnameyê wekî Özgür Gündem nîvîsandin. Her wiha ji bo Damokrasîyê ji ji ber ku daxuyaniyeke Serokê PKK Abdullah Öcalan weşandibû, pênc rojan cezaya girtinê stand.



RONAHİYA MED TV'YE li dijî çalakiyên Tirkîyeyê her ku diçe zede-
dir dibe. Berpirsê MED TV'ye nîha ji amadehiya vekirina studyoya Hollandayê dikin. Nûçegihanen MED TV'ye digel hewldanen raye-
darên tirk ji, bi hêsanî besdarî civînên Süleyman Demirel û Tansu
Çillerê dibin. Helwesta dewletên Ewrûpayê ji li dijî MED TV'ye
nermtir dibe. Tê ragihandin ku Tansu çiller di serdana xwe a Lon-
donê de wê tengazîriya xwe ji bo MED TV'ye ji rayedarên Ingîliz
re bîne zimên. Wekî tê zanîn li dijî gelek astengîyan MED TV'ye ji
nû ve dest bi weşanen rîkûpêk kir.

NÜÇE

Ber bi parlementoya federalî

Di Komcivînê 6'an a
PKDW'ê de biryat hate
girtin ku parlemento
ji bo ku veguhêze
Parlementoya Federalî ya
Bakurê Kurdistanê,
gavan biavêje. Di nav
van gavên pêwist e,
berfirehkirina nimînendetiya
parlementoyê, bicihbûna
li wê ya Kurdistanê û
guhertina navê wê ji heye.
PKDW'ê ji bo amadehiyê û
peyitandina derfetan,
heyetek şand başûrê
Kurdistanê.
Tê gotin ku di navbera
vê biryarê û daxuyaniyên
ARGK'ê yên ji bo "Herêmîn
rizgarkirî" de têkiliyeke
balkêş heye.

Gelê kurd ne bi tenê ji bo avakirina saziyên neteweyî xebatê dike, her wiha ji bo tekûzkirina yên heyî ji di nava çalakiyan de ye. Lewre li cihê berê mayîn ri-zîn e. Yanê saziyên ku hatine avakirin divê bi pêş de herin, rih vedin, tekûzitir bibin.

Di vî warî de Parlementoya Kurdistanê ya li Derveyî Welêt (PKDW), mî-nakek e baş e. Ji roja ku hatîye avakirin heta niha, ji bo pêşveçûnê di nava hewlan de ye. PKDW'ê digel hemû asten-gîyên ku komara tirk derxistin pêşîya wê, li paytexa Norwecê Osloyê komci-vîna xwe ya asayî ya 6'an pêk anî.

Di vê komcivînê de biryar hate girtin ku parlemento ji bo ku naveroka fi-rehtir bike û bibe Parlementoya Federalî ya bakurê Kurdistanê, gavan biavêje. Di nav van gavên pêwist e, berfirehkirina nimînendetiya parlementoyê, bicihbûna wê ya li Kurdistanê û guherti-na navê wê ji heye. PKDW'ê ji bo amadehiyê û peyitandina derfetan, heyetek şand başûrê Kurdistanê.

Tê gotin ku di navbera vê biryarê û



Endamên PKDW'ê di meşa mezin a Bonnê de li gel hev têne dîtin, Serokê Komîsyona Rêveber Zübeyir Aydar ji bo gel ahaftinê dike nan re, bi taybetî bi nûnerên PKK'ê re hevdîtin çêkirine. Dîsa hevalên me çûne Kampa Etrûşê, gelê me yî li wê de-re ziyaret kirine. Li gorî rapora ku ji me re hatîye şandin, hin derfetên baş bi dest xistine."

Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya der bârê Kongreya Neteweyî de ji ev tişt go-tin: "Ji bo Kongreya Neteweyî mirov dikare vê bibêje; heta di navbera hêzên kurd de, bi taybetî ji di navbera PDK û YNK'ê de aştî çênebe, pêkhatina Kongreya Neteweyî negengaz e."

Ji ber ku van rojan qala girtina Kam-pa Etrûşê dibe me li ser vê mijarê ji ramânê Kaya pirsîn. Birêz Kaya da zanîn ku tiştekî wiha negengaz e, lewre digel ku mercen jiyanê li kampê ne hê-san in ji, rêxistiniya gel xurt e, ci di wa-re belediyeyê de, ci ji di warê hêvotin û siyasetê de gavên baş hatine avêtin, komîte ava bûne. Lewre ji gel rê nade yên ku belavkirina kampê dixwazin.

Li aliyê din Yaşar Kaya li ser bom-bekirina Özgür Ülke'ye û çeteyan ji ev nirxandin kir: "Di nav dewletê de du

hêzên dijber hene. Yek ji wan piçekî çareseriye dixwaze, lewre ji dixwaze

dewletê ji karên pîs rizgar bike. Lî he-

ta meseleya kurdî çareser nebe, kirinê

tîmîn taybetî, leşker û cerdevanan ên li

dijî gelê kurd eşkere nebin, kesen sück-

dar neyên cezakirin, dewlet ji qirêjîyê

xelas nabe.

Hêzên dewletê Özgür Ülke bombe

kir, ji ber ku ew bûbû dengê gelê kurd.

Lî hate dîtin ku kirinê bi vî rengî ne

çare ne, dengê gelê kurd bi vî awayî na-

yê birîn. Niha ji du rojnameyên rojanê

yê kurdan derdikevin."

Digel daxwaza avakirina herêmîn rizgarkirî û hewla avakirina parlementoya federalî, şerê li Kurdistanê ji bi hemû gurehiya xwe didome. Li gorî daxuyaniya çavkaniyê gerîla di meha kewçêre de li Kurdistanê 368 çalakiyên gerîla pêk hatine. Di van çalakiyan de 701 leşker, 48 cerdevan, 68 faşist, polis û tîmîn taybetî hatine kuştin. Di vê mehê de tevî milisan 97 gerîla hatine kuştin.

SAMÎ BERBANG

'Rojnamegeriya kurdî bi paş de vedigere'

**Em di vê hejmarê de jî weşandina
hevpeyvînên ku HELÎM YÜSIV bi berpirsê
weşananen kurdên Başûrê Biçûk re
kiribûn, didomînin û hevpeyvîna ku ligel
Konê Reş hatiye kirin diweşînin.**

Birêz Konê Reş, hûn ji me re dikarin bi ci awayi destpêka rojnamegeriya kurdî ya li Başûrê Biçûk rave bikin?

Bêguman destpêka rojnamegeriya kurdî ii Sûriyeyê, di sala 1932'an de dest pê dike. Ji wan salên ku Mîr Celadet Bedirxan kovarê Hawar (di 15. 05. 1932'an de) û di pey wê de kovara Ronahî, (di 01. 04. 1942'an de) wesandin.

Ev her du kovarê bedew û delal Mîr Celadet Bedirxan li Şamê diweşandin, hejmarê Hawarê gihîştin 57'an yên Ronahî jî digihîştin 28'an. Hêjayî gotinê ye ku ev her du kovar, heta di nav rojnemegeriya erekî de jî ji yên herî pêşketî bûn; di wê heyamê de. Hem bi çapa xwe ya bedew û hem bi naverok û zengîniya xwe...

Bi baweriya min, bi derketina Kovara Hawarê qonaixeke nûjen di edebiyata kurdî de dest pê kir, çimkî gelek nivîskar û helbestvanen kurd peyda bûn û bûn bi nav û deng wek: Cegerxwîn, Osman Sebrî, Qedîcan, Reşîdê Kurđ, Dr. Nûredîn Zaza, Mustefa Ehmed Botî, Melle Evdilhadî, Mele Namî, Hesenê Kurd (Hesen Hisyar) hwd.

Bêguman akama kovar û rojnameyên Dr. Kamîran Bedirxan jî, di vî warî de hebû; Roja Nû û Stêr.

Lê mixabin pişti koçkirina Mîr Celadet Bedirxan di sala 1951'ê de, li Şamê û daniştina Mîr Kamîran Bedirxan li Parisê (di Sorbonê de) ev kesen ku me bi nav kîrin li ser şopa wan nelivîyan û bi kar û barê rojnamegeriyê ranebûn. Her yekî ji wan çend pirtûk çap kîrin û ketin nava rêxistinan, wiha ta bi sala 1968'an. Ji vê salê ve, rojnamegeriya kurdî li Sûriyeyê bû rêxistinî.

Cegerxwîn di rêxistina xwe de kovarek bi navê "Gulistan" derxist. Di pey re bi çend salan "Partî" yê ji kovarek bi navê "Gelawêj" derxist. Yeke din kovarek bi navê "Xunav" derxist, yekî jî yek bi navê "Stêr" (birastî bi derketina kovara Stêr re gesbûnek di rojnamegeriya kurdî de peyda bû, ew jî bi saya Zagrosê Haco û Reco, lê careke dî kêm bû ne wekî ku dihat xwestin).

Mixabin ku hejmara van rojnemeyan tevan ta bi roja iro negîhiştiye 30'yî, ango her yekî hejmara derketi-

na wê nebûye 30.

Di van çend salen dawîn de, çend kovar û rojnameyên din hatin holê, ew jî pişti derketina Gurzek Gul, mîna Zanîn, Roj, Pirs, Aso, Rewşenbîr, Deng û Delav II

Ji me re hûn dikarin behsa damezrandina kovara xwe û sedemîn derxistina wê bikin?

Ji sala 1982'an û vir de gelek rewşenbîr û nivîskaren kurd ji Rewanê (Ermenistanê) hatin nav me kurdên Sûriyeyê, wekî; Dr. Celîlê Celîl, Ordixanê Celîl, Cemîla Celîl, Tosinê Reşîd, Eskerê Boyîk, Prof: Aşûryan, Têmur Xelîl Muradov, Eliyê Evdilrehman û hwd. Hingê min gelek alîkarî bi wan re kir û gelek zargotin bi wan re û di pey wan re dan hev, hem jî bi rîka wan çend helbesten min di rojnemeya Riya Taze de belav bûn.

Ji wê hingê de ez bi zimanê kurdî mijûl bûm û min dixwest kovareke bi kurdî latînî biweşînim bi navê "Gurzek Gul", lê ez tenê bûm. Ta ku ez raserî hevalekî xwe hatim ku ew jî wekî min evîndarê ziman e, navê wî A. Baqî Huseynî yan jî "Lawkê Omerî" bû. Di serê adara 1989'an de me hejmara yekî ji kovara "Gurzek Gul" weşand, ta ku di hejmara 10'an de dubendî ket navbera me. Her yekî ji me hejmarek derxist, xêrxwaz ketin nav bera me, ew nema razî bû ku bi min re kar bike, xwest bi hevalekî din re kovarekê derîne bi navê "Zanîn", min jî di destpêka hejmara 11'an de kovara wan "Zanîn" pîroz kir û tê de min got:

"Malê ji te bi sed mal bin..." û min berdewam kir ta ku hejmara kovara "Gurzek Gul" gihîştin 15'an, di bîhara 1992'an de.


Kovara "Gurzek Gul" kovareke folklorî û çandeyî bû, her du heyan (mehan) me hejmarek derdixist. Beşdariya gelek nivîskar û helbestvanen kurdên Sûriyeyê tê de hebû, ji ber gelek sedeman min bi rawestan da. Ez bi hêvi me wê careke din ronahîyê bibîne.

Der barê rewşa iro ya rojnamegeriya kurdî de hûn dikarin gi bibêjîn?

Roja iro rojnamegeriya kurdî bi paş ve vedigere, berî çend salan di wextê xwe de, Gurzek Gul, Zanîn, Stêr, Gelawêj, Gulistan û yên mayî derdiketin, nivîskar û hoz a n

pir bûn, ta yên ku bi erekî dinivîsandin dest bi nivîsandina kurdî kiribûn, lê roja iro em mêze dikin ku Gurzek Gul nema derdikeve, Zanîn salê carekê, Gulistan du salan carekê, Stêr nema derdikeve, Gelawêj her pênc, şes mehan, Xunavê kes nabîne, ...,

Vêca ez mîze dikim ku ew kesen ku bi kurdî dinivîsandin, hin bi hin berê xwe didin nivîsandina bi zimanê erekî û ev yek gelekî xerab e, lê va ye deriyekî nû ji me re vebû. Ew defî jî Azadiya Welat e. Xwedê ji wan razî be, hema bi hêviya berdewam bûnê, bi berdewambûn



bigîhêje destê me û Xwedê ji nimînendeyen wan, yî saziyê ji razî be ku bêwest bi cangorî karê xwe dibin se-ri'

Konê Reş kî ye?

Nivîskarekî kurd im, li ser ziman û dîroka gelê xwe diponijim, bi tev hesten xwe. Evîndarê zimanê kurdî me. Xwe dibînim wekî şagirkê ji şagirtên Mîr Celadet Bedirxan. Ji hêviyên min yên herî mezîn di vê jînê de yek ev e ku ez her sibeh rojnemeyeke kurdî bi tipen latînî li ber deriyê xwe bibînim û tê de nûce û peyamên Kurdistan û cihanê bixwînim û ku ew rojname li teví Kurdistanê belav bibe.

Di sala 1953'an de li gundê Dodayê, li ser her du şî-vênen hesin di navbera serxet û binxetê de hatime dînyê. Di maleke folklorist û zimanperwer de mezîn bûme. Di sala 1972'an de min lîse kuta kiriye, di sala 1977'an de li dûv xwendina bilind çûme Almanyayê, lê mixabin min xwendina xwe nebiriye serî û zivirîme welat, ji ber gelek sedemîn civakî û aborî. Ta roja iro di 33 kovar û rojnameyên kurd û erekî de min nivîsandine, li Sûriye, Iraq, Iran, Turkiye, Ewrûpa û Ermenistanê. Çar pirtûkên min çap bûne:

1- Serpêhatiyê Mîran, Beyrûd 1991

2- Mîr Celadet Bedirxan, Jîyan û Ramanê wî, Şam 1992

3- Sîpan û Jin, Beyrûd 1993

4- Serhildana Sasûnê, Şam 1995

Pirtûkên li ber çapê:

1- Gurzek Gul, (pirtûka helbesten zarokan e)

2- Jin û jan, (helbest in.)

3- Romanek, ez navê wê nabêjim û çend pirtûkên folklorî jî hene.

**GURZEK
GUL**

kovara
folklorî û
çandeyî

jîmar (11-12) – aydar – 1991

Mele Egît û Hesen Axayê Bilotî

Dêrik, Dêrika Çiyayê Mazî, warê egît û şeran. Di teniştâ Qerejâxê de bajarekî dîrokî û xweşik e. Ji ber ku gelek caran hembêza xwe ji egît û mîrxasan re vekiriye, navê xwe bi ava zér nivîsandiye; bûye sembola egîtiyê. Her çiqas ji bo vê sedemê dengbêjan di gelek kilamên xwe de navê Dêrikê bi egîti anîbin ziman, wekî deverê Kurdistanê yên din ev bajarekî xweşik jî digel mîrxasiyê xyaneti di nava xwe de xweyî (xwedî) kiriye. Yanê careke din egîti û xyanet mîna du birayêñ cêwî li vir jiyanê.

Têkoşerêñ azadiya welat li Botan roj bi roj xurtir binecî dibûn. Lî di destpêka şoreşê de hinek serokeşiran hevalbendiya dewletê kiribûn, bûbûn ceş. Pişti sistema cerdevaniyê ku hate damezrandin, ev rewş ji bo ceşan bûbû sîr û şekir. Xwe firotibûn pereyan. Gelek endamên eşiran xwe kiribûn cerdevan...

Li devera başûrê Qerecdaxê Eşîra Metîna cih û war bûye. Di navbera Amed û Dêrikê de 32 gundêñ Metîna hene. Ji van gundan yek jî Bilotî ye. Di vî gundi de Hesen axa rûdinişt. Hesen Axâ hem serokcerdevan hem jî serokê eşirê bû. Serokcerdevan ji bo ku bikeve çavê dewletê gelek xerabî bi gel kiribû. Hatibû îsbatkirin ku li ser îxbariya Hesen Axâ gerîlayek şehîd bûbû.

Pîrejinek bi navê Gula Şîrînfiros hebû. Ew welatparêz bû. ji Serhedê koçberî Dêrikê bûbû. Lawê Gulê Silhedîn ketibû nav refen gerîlayan û şehîd ketibû. Birayê wî Mele Mihemed jî ji bo ku

tivinga birayê wî li erdê nemîne gîhiştibû gerîla. Gelê Dêrikê bûbûn şahidê Gula dayik ku dema lawê wê şehîd bûbû ew pir gîriyabû. Yuzbaşî gotibûyê "Tu çîma digirî, girîna te bêfeyde ye; berê tu bigîriyayî". Wê gotibû: "Yuzbaşî beg, ez ji bo mirina wî nagîrim; ez digirîm ku êdî wextê min borîye, nikarim lawa bînim."

Hesen Axayê Bilotî bûbû kujerê la-wê Gulê. Di demeke kin de berpirsê herêmê tesbit kiribû ku gerîlayê wan bi îxbara serokcerdevan Hesen Axâ hati-

vanê hêja tu bi xêr hatî, ji ku ve têyi bi ku ve diçî?

- Ez mela me. Ji Xirbê Gaya, ji bal Heyder Axa têm. Axayê min te pir silav dike. Dixwaze ku tu min weki melayê gund bigirî.

- Ha Heyderê me. Baş e, baş e ser çavan. Bi rastî ihtiyaciya min bi melayekî hebû. Tu dibinî gundi di xebatê de ne, ez li vir bi tenê me, bêhna min dernakeve. Rûçikê xwe tîrs kir û wisa got; "Lo mele, dibe ku tu apocî bî, min dixapînî. Ka ezanekê bixwîne!"

fon hebû. Mela wekî nobedarekî hatibû wezîfekirin. Axê digot, baweriya min bi jin û zariyên min nayê. Seyda, ji kerema xwe tu li telefônê binêre, nehêli tu kes pê bipeyive. Hesen Axa baweriya xwe wisa bi Mele Egît anîbû, êdî ewqas bêje bes e. Ji ber wî qasî her roj diçû gundekî. Rojekê li Girêşorê bû, sibetirê li Guha, Semika, Kevrêşînê, Pîran, Kanîspî, Sipyagê, Xirbê Gaya, Xirbê Belek bû...

Hesen Axa malik li xwe xera kiribû; nizanibû ku koza berxan teslimî gur kiriye. Bi ku ve diçû deqe bi deqe, saniye bi saniye cih û kîrinê wî ji berpis re dihate raporkirin.

Serê mehê hatibû. Hesen Axa ji mela re got: "Seyda iro emê herin meas bistînin, daxwazyek te li Dêrikê heye?"

- Naxêr axayê min, bi xêr herî û bi xêr werî. Bi tenê çend pakêt cixare bînî bes e.

- Ma ew jî tiştek e. Li ser çavan, li ser seran. Tenê tu miqayıti telefonê be.

Seydayê hêja cara dawîn ahîzeya telefonê rakir, nimareyek zivirand û hinek tiş bi şîfre gotin û nermenerme ahîze danî cihê wî û derkete derva. Axa bi hevalên xwe re di gir de qulibîn û seyda hêdî hêdî bi niyeta ser avê ber bi raserî gund ve çû. Çûyîn ew çûyîn e. Seyda hê tê.

Mele Egît: "Axayê min ez li bal Şêx Sellah mame, bavê min jî li bal Şêx Seydayê Cizîrê xwendîye. Em ji bav û kalên xwe de mela ne. Û dest bi ezanê kir: "Elah û ekber ellahû ekber", hê temam nekir Hesen Axâ got: "Melayê min temam di sewta te da min pê derxits tu mela yî. Tu melayê min î."

Axê, Mele Egît bi melatî girt. Dengê wî pir xweş bû. Axâ mabû di bin bandora dengê mela de. Têkiliyên mela bi şêx wî re bûbû sedema baweriyeke mezin. Di demeke kurt de axê tenê baweri bi mela dianî. Du jin û pir zariyên axê hebûn.

Di gund de tenê di mala axê de tele-

(DYA), çek û berikan, şûr û mertalan, tanq û topan, helîkopter û balafirên şer û her cure teftâlîn leşkerî dide dewleta romê, hevalbendê wan bû û niha jî dîsan hevalbendê romiyan e. Amerîka doh li pişta romiyan bû, iro jî dîsa li pişta wan e.

Wan çandan rojnameyeke tîrkan dînîvîsi ku endamê kongreya DYA'yê Cigirê Serokê Komîteya Helsînkî Senator Alfonse D'Amato pêşniyazek li ser mafê mirovan, meseleya kurdan û dorfegirtina ermenîyan amade kiriye û dixwaze wê pêşniyaza xwe pêşkêşî kongreyê bike. Di vê navê de li ser pêşniyaza xwe şîrove kiriye û bi rojnameyanan re guftûgo kiriye û gotive: "Birek eşqiya Tîrkiyê idare dîkin." Lî ji bîr kiriye û negotive ku "Heya iro me çek û sîleh didan wan eşqiyan û em li pişta wan rawestandî bûn. Bi çek û sîleh û me tîrkan eşqiyatî dikirin û hê jî dîkin."

Gava mîn ev nîvî xwend, min jî xwe re got gelek dereng be jî amerîkiyan tîrki nasîn! Tu dibêjî qey heyâ niha Kongreyê û amerîkiyan dîrok nexwandiye. Dinê û cîhan gişt Cengizxan û ateya (qewmî) wî baş dinase. Tişte ku min heymayî dihêle çawa heyâ niha pâturonên mezin û rîveberê Amerîkayê tê dermexistîne ku hevalbendê wan û tîrki û dewleta tîrki di destê eşqiyan de ye. Yanê amerîkiyan digotin qey Tîrkiyê ferşteh idare dîkin? Hemû dewletên emperyal ji berê de dizanîn bê Tîrkiye ci mal e û faşûn (quîma) wê ci ye. Herê Amerîka nû hîn dibe, lê hîn ez biçûk bûm diya min jî min re

gotibû: "Kurê min, tîrki eşqiyan e." Lî dîsan jî pir spas ji Yezdan re ku Mîstir Alfonse D'Amato li ser navê Kongreyê ûlan kir, li xwe mikur hat û got: "Tirtiyê birêk eşqiya idare dîkin." Ji vê pêşveçûna cîhanê re şabaş. Gelo bi rastî jî niha hûn dibêjîn ku Amerîkayê nû kîfî kir ku rîveberê tîrki eşqiyan e? Ez bi xwe ne bawer im. Xuya ye bi tenê D'Amato ji tiştekî bîncîlkirî û veşarî êdî tehemûl nekiriye û vereşiyaye derve. Ji ber ku cihê eşqiyyati tîrkan û veşartînê nemaye.

Ji bo Xwedê, bila Amerîka çekan nede dewleta romî, ew jî bi wan çek û berikan li ser rîre û dirban ranewîstin û xelkê bindest û pîşan pê neşîlinin. Wê çaxê em dê, ji vê gotina Senator D'Amato re li cepikan bidin.

Mîstir D'Amato li Tîrkiyê qal û behsa mafê mirova dike; yanê li Beriya Mîrdînê li siwârê hespê boz digere... Lî em dînîhîrin li ber de vê Wezaretiya Karê derve M. Christopher şîrove dike û dibêjî; "Em li hemberî terorê tîrkan destek dîkin." Ne qabil e ku haya Mîstir D'Amato û M. Christopher ji hev tune be:

Teror bi xwe iş û karê eşqiyan e yanê ê ku eşqiya be, terorist e. Ez dîsan dibêjîm Mîstir Christopher ev nebû, şâsiyek heye: Hûn çîma eşqiyyayan destek dîkin? Li hêlekê mafê mirovan, li hêla din eşqiya destek-kirin, naçin ber hev. Divê hûn dev ji hêlekê berdin.

A rast ev e ku hemû dewletên emperyal, wekî Mîstir Alfonse D'Amato rastiyê li xwe mukir werîn û aşû were landika mirovahîyê.

Mîstir de'Amato û eşqiyyatî

XURŞID MÎRZENGÎ



Eşqiya nezan e, nexwende û hov e, hîsîn wî yê sadîst hene û ji xeynî xwe û berjewendîyên xwe tu ramânên wî yên cîvakî nîn in. Zagonan nanase û edlâyî pê re. nîn e, sînorêñ mirovatiyê nas naqê û heta tû bibêjî qebe û dirende ye. Zilm û zora wî li ser reben û perîşanen e. Diavêje ser riyan û rîwiyan dişîlîne û tazî dike; diavêje ser gundan dişewîne, gundiyan dikuje û mal û hebûnên wan talan dike û direvîne. Dikeve nav bostanên xelkê xiyar, û qitayan jê dike, dikeve nava bax û rezê belengazan û tîrîyê wan-dixwe û yê mayî jî edîm dike; ji bo kîfa xwe mirovan dikuje, ji bo sîhetikirina çekên xwe dikare deh mîran bîde pişta hev û wan bikuje û seh bike ka çeka wî çawa ye. Bi ser de jî bi cendekîn wan qurbanan re dikare wîrîne bikişîne û wî wînîyê bêxe nav çarçoveyekê û di arşîvê bîranînên xwe de û bi wî wînîyê mîranî û mîrxesîya xwe bîne bîra xwe.

Çekên artêşa romiyan hemû malê Amerîkayê ne, Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê

Anketa xwendevanê Azadiya Welat

Hûn çend salî ne:

Tehsila we:

Karê we:

Hûn niha li ku rûdinin?

Hûn ji kengê ve bi kurdi dixwînin?

Hûn çiqas bi kurdi dizanin?

- Dixwînim
- Dînivîsim
- Hem dixwînim, hem dînivîsim

Zimanê we yê zîmkâkî kîjan e?

Hûn ji kengê ve bi kurdi dizanin?

Hûn ji kengê ve Azadiya Welat dixwînin?

Hûn ji xeynî kurdi bi kîjan zimanê din dizanin?

Hûn Azadiya Welat her hejmar dixwînin?

- Erê
- Carinan

Hûn Azadiya Welat bi ci awayî (ji ku) distînin?

Hûn zimanê rojnameyê çawa dibînin?

- Hesan (rehet)
- Dijwar (zor)

Hûn kîjan rûpelên rojnameyê dixwînin?

Hûn pêsi li kîjan rûpelan dinêrin?

Hûn kîjan rûpelan qet naxwînin?

Hûn bi kîjan zaravayê kurdi çiqas dizanin?

Kurmancî

- Fêm dikim
- Dixwînim
- Dînivîsim

Kirdki (zazakî)

XWENDEVANÊN HÊJA

Di vê anketa me de du celeb pirs hene. Yê li ku hemberî wan an jî li bin wan cihê bersivê vala ye, ji bo dagirtina we ye. Cureya duduyan jî pirsên ku li bin wan çend bersiv hene, divê hûn çeperastekê (çeprazekê) deynin pêşıya yekê an jî çend heban ji wan. Bi saya vê anketê, em difikirin ku li gorî daxwaz, hêvî û rexneyêne we kîmasiyêne rojnameyê ji navê rakin û ji bo rojnameyeke xweşik û hêjatir guherînê pêwist çêkin. Berî guherînan emê enama anketê jî pêşkêşî we bikin. Piştî dagirtina anketan, hûn dikarin rûpela anketê bibirin an jî fotokopiya wê bikişînin û ji me re bi lezgînî bişînin.

- Fêm dikim
- Dixwînim
- Dînivîsim

Kurmanciya jêr (soranî)

- Fêm dikim
- Dixwînim
- Dînivîsim

Li gorî we zimanê kîjan nivîskarêne Azadiya Welat sivik û hêsan

Bi ya we zimanê kîjan nivîskarêne me giran e?

Hûn dixwazin di Azadiya Welat de kîjan nivîskarêne din hebin?

Li gorî we zimanê nûçeyen me çawa ye?

- Sivik e
- Giran e
- Baş e

Di rojnameyê de hûn pirtir kîjan nivîsan dixwînin?

- Ên li ser zimên
- Ên li ser çand û hunerê
- Nivîsîti quncikan
- Nûçeyan
- Hevpeyvînan
- Nivîsîn mîzahî
- Nameyêne xwendevanen
- Nivîsîn ji bo zarakan
- Helbest
- Nivîsîn lêkolînî

Ji van mijaran hûn kîjan qet naxwînin?

- Ên li ser zimên
- Ên li ser çand û hunerê
- Nivîsîn quncikan

- Nûçeyan
- Hevpeyvînan
- Nivîsîn mîzahî
- Nameyêne xwendevanen
- Nivîsîn ji bo zarakan
- Helbest
- Nivîsîn lêkolînî

Hûn xaçepirsê çedikin?

- Tenê peyva veşarı dibînim
- Carinan çedikim
- Her tim çedikim
- Qet çenakim

Cihê ku em ji nameyêne xwendevanen re vedigetînin;

- Pire
- Hindik e
- Baş e

Bi ya we zimanê Azadiya Welat bi giranî;

- Botankî ye
- Xerzankî ye
- Torankî ye
- Serhedkî ye
- Amedkî ye
- Kurdistanî ye

Hûn kîjan aliyen Azadiya Welat xurt (baş) dibînin?

Hûn kîjan aliyen Azadiya Welat gels dibînin?

Li gorî we nivîsîn Azadiya Welat;

- Kurt in
- Dirêj in
- Baş in

Di Azadiya Welat de nûçe (xeber)

- Hindik in
- Pir in
- Baş in

Ji bili Azadiya Welat hûn kîjan weşanan (rojname û kovar) dixwînin?

Hûn kîjan weşanan diecibînin?

Azadiya Welat gerek e;

- Dîsa hefteyî derkeve
- Bibe rojane
- Bibe duhefteyî
- Bibe mehane

Di Azadiya Welat de nivîsîn bi kirdki û kurmanciya jêr;

- Hindik in
- Pir in
- Bes in

Hûn dixwazin ku di Azadiya Welat de bêhtirkîjan mijar hebin?

Hûn siyaseta weşana Azadiya Welat çawa dibînin?

Di xwendina Azadiya Welat de ci tengasyêne we hene?

Hûn bihayê rojnameyê çawa dibînin?

- Erzan e
- Biha ye
- Baş e

Ji bili we çend kesen din ji rojnameya ku hûn distînin, istifade dîkin?

Hûn rojnameyê ji malîyen xwe re dixwînin?

- Erê
- Na
- Carinan

Divê ferhengok di rojnameyê de;

- Hebe
- Tune be
- Hebe û cihê wê firehtir be

Raman û nêrînen we yêne din hebin li jêrê biniyisîn;



● 10.12.1948

10'ê berfanbarê Roja Mafêni Mirovan a Navneteweyî ye. Roja 10'ê berfanbara 1948'an ew roj wekî roja mafêni mirovan ya neteweyî hate flâkirin. Ev roj di sala 1950'an de bî navê hefteya mafêni mirovan hate pîrozkin. Tirkîye di sala 1949'an de ev daxuyaniya mafêni mirovan ya gerdûnî ìmze kiriye.

● 11.12. 1918

Komeleya Serbilindirina Kurdistanê di 11'ê berfanbara sala

Ji nû ve Koma Amed



Pişti çend mehan. dîsa koma Amed li Navenda Çanda Mezo-potamyayê şaxa Stenbolê derkete ser sahneyê. Ji destpêkê komê heta roja iro wê komê ji ber hin sedeman pir hunermend guhartin, mirov dikare bibêhe heke ew hunermendêni ji komê vejetiyen bêne ba hev wê orkestrayeke biçük pêk were.

Berî çend mehan hevalekî wan bi rastî ji di komê de xwedî cihekî gi-rîng û hunermendekî hêja-bû ji ber hin sedeman mîcûr ma ji Tirkîye'ye veqete. Ji ber vê kemasîye kom demekî ji guhdar û temaşevanê dûrma. Di 28'ê meha Sermawezê de Koma Amed konserek pêşkeshî temaşavanê xwe kir, eleqe pir zêdebû, salon tijebû her kesî meraq dikir ku 'Mâ dîsa Koma Amed wekî berê ye?' Lê dema ku derketine sahneyê ji amûrîn ku bi kar tînin bigire, heta stranbêjîn wan, pir tişt nû bûbûn, içar ji temaşevana stranên wan meraq dikirin, 'Gelo stranen nû hene?' Dema ku konserê dest pê kir, her tişt kifş bû, Koma Amed zû bi zû ji temaşevanê xwe dûr hakeve, heta her diçe xwe xurt dike.

Bi her awayî pir-rengiyek li ser sahneyê kifş bû. Bi her zaravayê kurdi stran gotin û stranen nû ji hebûn di bernameya wan de. Wekî stranen "Zerdé", "Sulîxan", "Hewar bî", "Lûrlûr tesî" ev stran gelêri ne lê bi xebateke berfireh hatine berhevkin. Ji bilî wê di pêşkeshîn de ji pispo-riya xwe nîşan dan. Ahenga di nav deng û amûrân muzikê de, pîrbûna amûrân, stranen ji her zaravayê kurdi

nîşan da ku bi rastî ji xebateke hêja kirine. Her wiha dahola, zîla ku me di stranen rock, pop, caz de didit pê stranen kurdî yêng gelêri dihatine pêşkeshîn. Ew ji tîştekî cihêreng bû. Li hêla din strenek ji bi defa dengbêjan pêşkeshî kirin, ew zêdetir balkes bû.

Li aliye din muzîka kurdi ya gelêri bi pîrbûna amûrân ji pîrdengiyekê muzîka gelêri pêk anîbûn. Dîsa hunermendekî ku nû besdarî komê bûye ji hem xweşbûna dengê wî û hem ji çend stranen gelêri yêng ku bi xwe berhev kirine rengekî nû dide komê.

Stranen ku bi soranî û zazakî pêşkeshî kirin ji balkes bûn wekî "Nisan mangî bihar", "Milem qesem" ya zazakî ji bi navê "De way way" bû.

Ya herî balkes "Nisan mangî bihar" e bû ku vêga di nav îliteratura muzîka tîrkî de bi navê "Ağlama yar ağlama" tê naşin.

Bî her awayî konser bas bû, du saet domiya, temaşevanen ji pir ecibandin. Koma Amed di nêzîk de kasetekî ji derdixe, hin stranen nû ku di konserê de ji pêşkeshî

kirin wê di kasete de cih bigirin û çend stranen wan ên ku di kasete wan a yekemîn "Tu Külfîka Azadiyê" yi de cih digirin ji wê ji nû ve bistirin di kasete nû de. Tiştî herî balkes ew bû ku piştî çend mehan ev kom careke din derkete pêşberî temaşevanen, bi xebateke nûjen û xurt. Lê mixabin, xisletekî nebas xuya dikir. Ji bilî zimanê stranen û çend hevokên destpêkê, axaftina berî pêşkeshîn stranen axaftin giş bi tîrkî bûn.

METİN AKSOY

1918'an de hate damezirandin. Ev komele pişî 30'ê kewçêra 1918'an ku Peymana agirbestê ya Mondrosê hat ìmzikirin komele bi destê serokê wê Saîd Ebdulqadîr û hevalen wî Huseyîn Şukrî Beg (Baban), Dr. Mehemed Şukrî Beg, Muhamîd Namî, Azîz Beg û Babazade Hîkmet Beg hatiye damezirandin.

(Li gorî Nûrî Dêrsimî, Seîd Ebdulqadîr, wekî ajanê Osmanî kar kiriye).


14'ê berfanbar 1960'î li Neteweyen Yekbûyî (NY), belavoka mafê diyarkirina çarenûsa xwe ya gelên bindest hate pejirandin.

AWIR

ÇAVDÊRÎ

MİRHEM YİĞİT

Çanda ajotina ser probleman



Em civateke bi problem in. Dijwarî û serêşen me zehf in, li ber qirikê ne. Çamedorêne me nelibrî û şikestek in. Her der mîna sıfrê û waweylê ye. Serê gavê tu li problemekê dîterpîlî. Li dijwariyekê tu rast têyi û dikevî şing û pêxêra serêşekê. Astêrîn hene, alozî û berhelîstêni bi hezar rengî, ne bi hejmartînê diqedin û ne ji bi gazinêni ji wan em digihêjin cîhekî. Gotineke navdar heye, dibêje: "Dev ji gazina ku 'her dever tarî ye', berde li şûna wê mûmêkê pêxe".

Kes û komik hene ji probleman direvin. Naxwazin bi wan re bêñemberî hev û du. Riya xwe ji ser wan dadigerîn, ji wan dipelikîn û silahîyan dîkin. Gava pêjnâ dijwariyekê tê, sehwê û siya problemekê berçav dibe qûnaqûna dîbin, ditexin, fireh diftilin. Ü bi piranî derdikevin cîhekî raser an ji ji tenist û qiraxan dîbin temâşevanê şerîn bi dijwariyan re.

Tiştî ecêb û sosrêthêner ew e ku ev celebê çavşîkestî û çavtirsiyayî ji herkesî zêdetir, ji probleman bi gazin in û ew çendî nûzenûzê dîkin ku serê mirov dîbin.

Gazinê ji probleman, tîrsa ji wan û xwedûrgirtina ji wan ne problemen hene kêm dike û ne ji dibe çareyek ji bo dermankirina derd û dijwariyan. Çû welat û neteweyekê problemen xwe bi gazinan û reva ji wan, çareser nekiriye. Dîrok nimûneyekê wiha nas nake û ne mimkûn e ku mirov karibe li tiştî wiha rast bê. Her netewe ji problemen xwe berpîrs e û ji bo problemen xwe divê ew bi xwe rê û çare ci ne, pêde bike. Ü divê barê xwe hilgîre, bi desten xwe pişta xwe bixwurîne:

Di jîyana ademîzad de problem xwedî cîhekî binirx in. Her problem bi xwe girêkek e, deriyekî zañebûne û şîrek e, hêz û keyseku nuh e. Vekirina girêkan, çareserkirina probleman mirov bi pêş dixe û baweriya mirov xurtir dike. Her çareserkirin zanabûna-însan, perspektifî û bergehêñ însan firehtir dike û pêşxistinê bi xwe re tîne. Di jîyanê de serketin yan ji binketina mirovan bi taqeta mirov a li hemberî dijwarî û probleman û çareserkirina wan ve pihêt girêdayî ye. Bi gotineke din problem hem ji ser riya jîyan û birêveçûnê berhelîst û dijwarî ne û hem ji pêpelekîn pêşketînê ne. Gava ku mirov zora dijwariyekê dibe, ji pêşya xwe dide alî, dibe xwedîyê îmkana ku çend gayen din bavêje û çend mişwarîn din li hedefî biqedime.

Mezinbûn û Geşbûna mîjîyî însen, firehbûna kapasîteya, fîkrî û rewşenbirî bi xwe ji pir girêdayî berhembêzkirin û çareserkirina probleman û dijwariyên cur bi cur e. Bijûndarî û xweseriya fîkrî ji wiha ye; Mêjî bi pêdaketin û mijûlîhiya bi probleman re sexa dibe, bâlxî û bi xwe ewletir dibe. Mirov dikare wiha ji bîbêje: Mêjî bi xwe hîneki ber û produktê problem û dijwariyan e. Zaroka wan û qerzadarê wan e. Li gorî teoriyekê tiştî ku însen bi xwe ji kiriye, cûna ser probleman û hewla rakirina wan e. Dilîn xurt, moralen saxlem û İradeyîn qewîn ji di nav keferata bi probleman re tîn pê. Nêxweşîyen jîyanê, qiriktehlî û kezembreşen li ser riya pêşketinê bêaşînayî, bêamaedeyî û hostetiyeke çendalî ji bo rakirina probleman, ranabin. Dîroka mirovatiyê, netewe û giş parzemînen hene piştgiriya ve dîtinê dîkin û İspatan miş in. Her pêşketin pişta xwe dije zanebûna berê û kelepor û tradisyonen berhembêzkirin û çareserkirina probleman sal û qîrmîn buhuri, ji vê awirê bêdudîlî mirov karê bibêje ku her berhembêzkirin û çareserkirina problemekê qezencek e. Şewekozik û şewedeshelatdariyek e, mertal û zirxek e, mewzî û destkeviyek e.

Problemên mezîn û biçük hene, yên şexsî û neteweyî, herêmî û weletgîr hene. Problem ji probleman mezintir, henê û hin dayikên ên'din in. Hin tamor û kiliten serekîne. Çareserbûna gelek problemen şexsî, malbatî, herêmî û hwd. girêdayî çareserkirina wan e. Gotina dawî: Tevgera rizgarîxwaz ev 15-20 sal in tovê kultureke nuh direşîne li welatê me. Ev ji kultura berhembêzkirin û çareserkirina probleman e. İro ku ev bîzir şîn hatiye, edî hew tişt bi me tê, probelêm hew karin bi me û edî çavêne me ji dijwarî û probleman natırsın.



Wekî hemû nirx û hêjahiyyê me, muzîka kurdî bi destê xwefiroşan tê xerakirin. Êdî ew rewş gihiştîye wê radeyê ku stranên hozanên kurd ên navdar jî ji destê wan xelas nabin. Roleke Azadiya Welat jî parastina nirxên neteweyî ye. Ji bo vê yekê jî em kom û kesen ku li ser riya rast kedê didin, bi gelê xwe didin nasîn. Bi vê mebestê hevalê me TURAN YAPITIRAN' hevpeyvînek di gel Koma Rojhilat pêk anî.

Gotin û meqamên muzîka kurdî ji hev nabin

Koma Rojhilat ji çend kesan pek tê û çi wextê ava bûye?

● Koma me di sala 1992'yan de, pişti sazkirina NÇM'ê bi salekê ava bû, em çar kes in.

Hûn der heqê xebata xwe de karin hin agahî bidin me?

● Niha em xebata xwe di bin banê saziyeke neteweyî de. didomînin. Armanca me ew e ku em muzîka kurdî bi zanistî bi gelê cîhanê bidin nasîn û wezîfe ya hunermendî li hemberî gelê xwe pêk binîn, ji ber vê yekê em niha di nav xwe de perwerdehiya mizûkê pêk tînin, muzîka cîhanê dişopînîn û dimirxînin. Em helbesten nû çedîkin, û bi piranî ji em li ser helbesten gelêrî lêkolinan çedîkin. Ji bo derxistina kasetekê em dixebeitin.

Çima Koma Rojhilat?

● Niha şerekî bi qirej li Kurdistanê didome, di vî şerf de bi hezaran gund tê şewitandin, bi hezaran mirovîn me têne kuştin û gelê me ji cih û warêن xwe bi zorê tê koçkirin. Lî disa jî li hemberî van kirinan tu carî gelê me ji fikra azadî û serxwebûne dûr neket û ji bona vê. yekê jî serhildan û raperîn e her roj. Ev tişteki pir girîng e. Ji bona vê yekê her roja

ku hiltê ji gelê me re hêvî ye û her roja ku hiltê ji bo gel rojeke nû ye. Em vê yekê didine ber çavêن xwe û em dibêjin Koma Rojhilat. Ew roja ku hezar sal bû li welatê rojê hilnedihat iro tîrêja wê da-ye hemû cîhanê. Me navê koma xwe ji vê roja nûhilatî hildaye û em bi hêvî û bawer in ev roja nû wê ji gelê kurd û gelê bindest re bibe serxwebûn û azadî.

Koma Rojhilat ji alfabeaya muzîka ango ji ilmê muzîka çiqası haydar e?

H

Her çiqas muzîka heyî li ser formen folklorîk bi pêş ketibe jî, lê bi temamî muzîka kurdî ya folklorîk derneketiye holê. Em dixwazin hîn bêhtir derxin û rengekî nûjenî bi gel bidin hezkirin û lê xwedî derkevin.

● Hinek hevalêne me berî ku dest bi xebateke kolektifi bikin ji muzîka kurdî hayirdar bûn, em dikarin bibêjin bingeha xwe di nava jiyana gel de girtibûn. Lî pişti ku di NÇM'ê de me dest bi xebata xwe kir, zêdetir li ser zanistiya muzîka kurdî li ser zanistiya muzîka dinyayê, em lêkolinan çedîkin û hîn dibin; li ser harmoniyê, gitar û li ser şanê (teknika deng) hevalêne me diçin kursan, li ser enstrumanan em xwe bi pêş de dibin û ji bo

fîrbûna zimanê muzîka em xebateke kûr didomînin.

Gava ku hûn li ser besteyan an jî muzîka kurdî dixebeitin ci qaydeyan didin ber çav?

● Berî her tişfi em formen kurdî didin ber çavên xwe û li gorî wê gavan diavêjin. Bi vê re zimanê ilmî pir girîng e û em dibêjin zimanekî ilmî emî bikaribin. çiqasî di muzîka kurdî de bi cih bikin. Mîna harmonî û hwîd. gava ku em van jî bi

iro gelek meqamên muzîka kurdî nehatîne bikaranîn. Mîna usûlîn yekgîrî, usûlîn tevlihev. Ji van usûlan gelek tenê bi erbanê hatine lêxistin, meqsedeke me yadin jî ev e ku em van derxin holê. Ya din jî gava ku em besteyan çedîkin çavkanî ji bo me jiyana gel e, hunermend ji gel nequtkirî ye. Eşa gel, jâna gel, serhildana gel, raperîn û berxwedanê gel bêz zanîn. Em van didin ber çavên xwe û li gorî wê besteyan çedîkin.

Gava mirov li Koma Rojhilat guhdarî dike bêhna muzîkeke otantîk, folklorîk û gelêri jê tê, pirsa min ev e, hûn vê xebata xwe çawa dinirxînin?

● Weki we jî got, gava ku mirov li Koma Rojhilat dinêre bêhna muzîka otantîk, folklorîk û gelêri jê te. Ev rast e, ev jî ji vê tê: Gelek hevalêne me ji bicûkatîya xwe û vir de li Kurdistanê, di nav gel de mezin bûne, bi gel re jiyane. Her çiqas muzîka heyî li ser formen folklorîk bi pêş ketibe jî, lê bi temamî muzîka kurdî ya folklorîk derneketiye holê. Em dixwazin hîn bêhtir derxin û rengekî nûjenî bi gel bidin hezkirin û lê xwedî derkevin.

Em dibinîn ku muzîka kurdî ji hêla dewletên mêtînger ve tê xerakirin, bi awayekî nebaş tê bikaranîn. Cih bi cih hunermendîne me kurdan jî li hemberî ki-

lamên gelî, otantik şâşî kirine. Meqam ji gotinan veqatandina, gotinê nû li ser meqamên kevin danîne û mîna besteyeke nû nîşan dane. Ev tişt pir me diêşîne. Ji ber ku bingeha muzîka kurdi di van kalamân de veşartî ye; bingeha folklora kurdi di wan gotinan de veşartî ye.

Lazim e baş lê xwedî derkevin. Muzîka kurdi baş nehatiye kolandin. Di nava gel de bi hezaran klam, dîlok, lawje, heyrano hene. Heta ku ji destê me tê em van didin hev ji devê dengbêjîn ku hîn sax in, ji devê ixtiyaran û hwd. Bi vê re her klamekê babetek wê heye, dirokeke wê, sebebeke wê heye. Em van jî dinivîsin. Dengbêjî jî heye di jiyanâ gel de li tevdeka muzîka neteweyan binêrin, tiştekî wekî dengbêjîye tune ye. Dengbêjî di nava muzîka me de jî kêm bûye. Em naxwazin ev reng wîndâ bibe, em dixwazin vê jî bi dînyayê bidin nasîn. Ji ber ku her dengbêjek rûpelekî dîrokê ye. Ew di nava edebiyata me ya kurdi de cihekî girîng digire.

Her dengbêj hem dîrokzan e, hem wêjevan e, hem zimanzan e. Em der heqê dengbêjan de jî lekolinan çedîkin. Em dixwazin dengbêjan jî bi gel bidin naskirin. Tiştekî din, gava ku em li dîroka muzîka cihanê dinêrin, hunermeden mezin tevan xwe li ser muzîka otantik bi

Dengbêjî jî heye di jiyanâ gel de, li tevdeka muzîka neteweyan binêrin, tiştekî wekî dengbêjîye tune ye. Em naxwazin ev reng wîndâ bibe, em dixwazin vê jî bi dînyayê bidin nasîn. Ji ber ku her dengbêjek rûpelekî dîrokê ye.

ka gelan ji hev vejetîne.

Hûn bi ci pîvanan muzîka kurdi û ya gelên din jî hev vediqetînin?

● Di hemû muzîkên cihanê de pîvan hene. Ji van pîvanan gelê Rojhilata Navîn jî bi kar tînin. Di ya kurdi de jî maqamên wê hene, mîna: Kurdîlî hîcâzkar, çargeh, ûşak û hwd. ji bîli vê form hene, neqîs hene, awaz û ziman û hwd. Mirov dikare muzîka gelan ji hev vejetîne û bibêjî ev bi kurdi ye an ne bi kurdi ye. Bi vê re pîvan jî girîng in, mîna: 4/4, 2/4, 5/8, 6/8. Le belê muzîka kurdi ne bi tenê li ser van pîvanan e, hînek pîvan hene ku em wan bibêjîn ez bawer im wê bibêjîn ev yewnanî ye, gelo ewrûpî ye an bi tirkî ye, hînek form jî bi vî rengî hene, mîna usûlîn tevlihev, usûlîn bingehîn û hwd. lazim e mirov van jî bi kar bîne.

Li jor jî we qal kir, di pîvanan kurdi de pîranî 6/8-2/4-4/4 tê bikaranînin. Ew pîvanan din cîma nayîn bikaranîn?

pêş de bibin. Nekirina vî tiştî kîmasiyeke pir mezin e.

Gava ku muzîka nûjen bê çêkirin lazim e mirov li ci miqate be?

● Her mirov bi zimanê xwe, bi çanda xwe dijî. Jîyan li gorî vê ye. Muzîk jî, ji vê bi dûr neketiye. Muzîka ku bê çêkirin, divê ji gelê xwe, ji zimanê xwe, ji çanda xwe ne dûrkîtî be. Gava ku dûrkîtî be ev ne nûjeniyek e ji muzîkvanen kurd re. Her wiha muzîka kurdi li ser bingeha xwe bilind dibe, deriyê muzîka nûjenî yek jê ev e. Xaleke girîng jî gelê kurd iro di pêvajoyekê re derbas dibe, lazim e muzîkvanê kurd vê rewşê bide ber çavan, yanê şerê xwe, rewşâ gelê xwe bide ber çavan û li ser vê bingehê gavan biavêye. Li dijî vê rewşê hunermend bîst gavî jî bi pêş de biçe, nabe tiştek, rûmeta wê xebate çenabê. Dîsa lazim e li otantizmî miqate be ku xêra neke.



pêş xistine û ew ji xwe re bingeh qebûl kirine û bi vî rengî muzîka xwe ya neteweyî bi pêş ve birine, ev ji me re nimûneyek e, em jî dibêjîn ger mirov nebe neteweyî, nikare bibe navneteweyî.

Di muzîka gelan de qaydeyîn bingehîn ci ne?

● Gava ku mirov muzîkê gelan dinirxîne, hînek qayde derdikevin holê. Li gorî me qaydeyîn bingehîn awayen jiyanâ wî gelî ne. Tişteñ ku tesîre lê dîkin aborî ye, jiyanâ sosyolojîk, antropolojîk û ziman. Xaka welêt jî şeklekî dide muzîka gel. Bi vî rengî mirov dikare muzî-

● Pir hindik me anî ziman, lê em dikarin hînekî din jî kûr bikin. Muzîka kurdi di zayına xwe de di nava folklorê de hatiye afirandin û parastin. Ji bo vê yekê 2/4, 4/4, 6/8, 3/4 an jî 8/8 didomin.

Ev pîvanan din jî mîna 15/8, 15/16, 9/8 û besen wan jî hene. Hînek klamên geleri ji hêla Meletê ji me re hatine, geleri ne, em lê dinêrin yek jê 15/8 yek jî 15/16 pir pîvanan cuda ne û zêde nehatîne sixulandin. Iro em li NÇM'ê, li Hunerkomê, li hunermeden wekî din dinêrin, hemûyan jî 3/4, 2/4, 6/8, carinan jî 5/8 bi kar anîne, pir bi pêş de nebirine. Lazim e hunermeden kurd muzîka kurdi û pîvanan wan tevan bisikulînin û bi

Hûn dikarin der barê enstrûmanen kurdi de me agahdar bikin, yan jî hûn dikarin bibêjîn ev enstrûma a kurdan e?

● Em bawer in ev pirs di mîjîye gelekk kesan de heye. Heya roja iro me nedîtiye ku der heqê enstrûmanen kurdi de tu kesi tiştekî bi rûmet bi dest xistiye. Ji bona bersiva pîrsa we jî lazim e em li sê hezar sal berê binêrin, dîrokê binixîn. Berî mîladê bi 1500 salî li Mezopotamyê şer hebû, heya Yewnanistanê dirêj dibûn. Pişti ku ji Yewnanistanê vegetriyan, sünde kişiyan îlis li wê dere xwe nîşan daye, enstrûmaneke tek tîl e, yek jî jê dengê 'koma' li wir hiştine. Bi rasti jî li ser vî dengî û vê enstrûmanê nîziki 150

salî munaqeşe hatiye kirin. Ji ber ku muzîkvanen yewnan digotin ev ne yên me ne. Lê ci kirin jî, êdi nikaribûn wan ji xwe veqetînin û di nava muzîka wan de bi cih bû.

Em dinêrin enstrûmanen mîna saz, qopuz, bisq ji Mezopotamyayê derbasi gelên din jî bûne, ji bo vê yekê em bibêjin ev enstrûman yên kuran e, nabe. Ji ber ku heta niha dewleteke kurdan, çenebüye, gelek enstrûman nikaribûn biparastana, dewletêne wekî din ji xwe re birene, lê xwedî derketîne. Dîsa tevî van bûyeran em dikarin vê jî bibêjin bilür heye, saz heye, heta gitar jî heye, gitar bi xwe enstrûmaneke Mezopotamyayê ye.

Gelek sal berê derbasi İspanya, Meksikayê. Ji xeynî van def heye, zurne heye. Di Rojhilata Navîn de gelek welat wan bi kar tînin. Bi kurtasî rewşa enstrûmanen kurdî jî mîna ya diroka kurdan e, hînekîn din jî xwe re kirine mal yan jî bi nîvîskî nehatiye nîvîsandin, lê em di wê baweriyê de ne ku wê jî iro û pe ve bê nîvîsandin.

Li ser gitarê ez mînakekî bidim. Hevalen me dema ku çûbûn İtalyayê li wê derê ji wan re gotibûn, gitar ji Mezopotamyayê hatiye. Heta ew kesê ku anîye ji navê wî "Qijika Reş" e û navê dibistaneke xwe jî daniye "Qijika Reş".

Muzîka ku hûn çedîkin, hûn bi xwe ci navî lê dîkin?

● Em niha di pêvajoyeke lêkolînê de ne. Berî her tiştî lazim e em muzîka xwe û muzîka cihanê nas bikin. Heta kategorî neyê naskirin, tiştek dernakeve holê. Pêşî divê mirov ilmî muzîke nas bike ji bo ku tarzekê mirov bide rûniştandin. Em a niha naxwazin navekî lê bikin, lê em dixwazin otantikiyeke nûjenî bidin rûniştin.

Hûn di nava komê de ci enstrûmanan bi kar tînin?

● Di nava komê de vê gavê piyano heye, tûd heye, baxlama, gitar, erbane, dahol û ji xeynî van jî em li ser ney, mey û hwd. dixebeitin ku bi pêş de bibin.

Emê ci wextê karibin li vê di kaseta we de guhdar bikin?

● Niha kaseta me li studyoyê ye, hindik maye ku xelas bi be. Lê em dikarin mîzgîniyekî bidin, berî Newrozê ev kaset wê derkeve.

Belê ji kasetê ku hene cudatir, emê ci di kasetâ we de bibînin?

● Em bawer in hûnê hînek cudayiyan bibînin: formeke otantik, pirengî, dengbêjîye hûnê tê de bibînin. Pirdengîya deng û pirdengîya enstrûmanan di nava hev de hûnê bibînin.

Hûn jî dizanîn ku bingeha çandê ziman e. Pirsa min ev e: Hûn di nava xwe de kîjan zimanî bi kar tînin?

● We pîseke pir balkê pîrsî, em tev bi kurdi dizanîn, di xebatê xwe de em bi kurdi dipeyivîn, lê gava ku tiştekî teknîkî be, polîfîk be em bi tirkî dipeyivîn. Di jiyanâ rojane de jî piranî em bi kurdi dipeyivîn, lê kîmasiya me di hêla ziman de jî heye.

Helbestevanekî xemgîn û dilgerm Xemgînê Remo

Ev hewar û gazî, ji layê bi hezaran 'Xemgîn'ên welatperwer û dilovan ve ku li hemû cih û waran, li hemû merc û gavan hest bi êş û azara gelê xwe dibin, bêguman, li ser rûpelên rûmetî dilan, gav bi gav, war bi war wê bêne nivîsandin.

Sînorêng cavêng te keskayî ne
Bo çivikêng dilan,
Pepûkê.
Ü xewnêng hemî xewnedaran e
Ey xewna xewne-rojêng min.

Ma tu caran têne jibîrkirin ew rojêng têrmirin û têrxwîn?! Ew rojêng ku li şûna şîrqîniya hewr û tavêng biharan gurmîna topang û giregira firokan, li şûna sivikbarana adar û nîsanêng Kurdistana rengîn, barîna jehr û keratiya ji asmanê kesk û şîn, li şûna leyistika balbalîskê û çavgirtikê, tîrs û lerzîn û revîna 'çivîkêng' pîxwas û tazî li ser keskesînorêng 'çavêng pepûkê', li nav keviyêng berfê digel hewar û gaziya dayikêng dilovan bi qêrîn û nalîn. Ma tu caran têne jibîrkirin ew rojêng têrmirin, ew rojêng têrxwîn?!

Bêzarê, bizanibe, ku
Taristana dilê min
Bi du şemalkêng cavêng te
Ronî dide
Bûkê...
Ey ronahiya
Roniye ng min.

Her çende di rewşen wisa xemgîn û neçar de li ser dilê hemû welatperwan taristanî vedigire ji, lê vegirtina taristaniya li ser dilê helbestvanekî rûnerm û dilgerm cudatîr e ji ya her kese-kî û hetanî ku li darê dînyaya gewrik hebe, ji bo ronîkirina taristaniya dil wê jar û bendewarê 'her du şemalkêng çavêng 'Bûka bêzar' û serbixêli be, ta ku bi ronîya het du çavêng pir evîn û xumar yêng bûka serbixêli û bêzar 'Ronahiya ronahiyêng min', ango, azadî, rizgarî û bexteweriya pêdîvî û ya bênamebir bêne ronîkirin. Ü:

Ji layekî ve dil arjejin e
Ü ji layê dî ve
Zozan e, Şehnişîn e.
Gulê, êdfî were.
Li hêlekê berfê bibarîne
Ü li hêla din gula bibîşkivîne
Gula min, gula min...

Ev hewar û gazî, digel kel û şîrandîna dil bi agirê evîneke têr-rûmet, hetanî bi gîhistina roja azadiya yekcari ve-

namire, wê bidome, bidome û her bidome. Ev hewar û gazî, ji layê bi hezaran 'Xemgîn'ên welatperwer û dilovan ve ku li hemû cih û waran, li hemû merc û gavan hest bi êş û azara gelê xwe dibin, bêguman, li ser rûpelên rûmetî dilan, gav bi gav, war bi war wê bêne nivîsandin.

Bi kurtayî jînenîgariya helbestvanê me.

Xemgînê Remo, di sala 1961'ê de li Başûrê biçûk û welat, li gundê Talikê ku bi ser navçeya Derbêsiyê ve ye ji da-yik bûye.

Di sala 1991'ê de yekemîn pîrtûka xwe ya helbestî, bi navê "Axîna dil" li Şamê weşandiye. Ev dîwana wî ya ku destpêka berhemdana wî ye, ji gelek helbesten klasîkî pêk hatiye û helbesten wî yên berî 1985'an in.

Vêca, berî çapkirina vê dîwana xwe, ev helbesten klasîkî yên ku wê bêne çapkirin, li dawiya sala 1990'î, ji bo nîrxandinê nîşanî min dan. Wê hingê, min jê re got ku; ev helbesten te lawaz in, gelek helbesten te yên hevçerx ku di asteke berbiçav de ne, hene. Li şûna van helbesten xwe yên klasîkî û lawaz, tu çima van helbesten xwe yên ciwan û hevçerx nađî çapkirin?!

Xemgînê Remo, li hemberî vê pirsa min, bi zimanekî nerm û bi xwe bawer, wisa bersiva min da; Ev helbesten ku tu wan lawaz û ne hêjayî çapkirinê dibinî, berhemên min ên destpêkê ne. Li ber dilê min pir şîrîn in.

Ya ditir ji, dema ku ez duwemîn pîrtûka xwe ya ku ji helbesten min ên nûjen pêk hatiye derbixim, wê çawa pêş-deçûna min ya di helbeste de bê zanîn? Ji bo ku xwendevan cudahiya di navbera her du pîrtûkan de karibe bi sanahî bibîne û binirxîne, bê ka di ristina helbeste de pêşkeftin bi min re çêbûye yan na. Ji ber vê yekê, ez dixwazim ev helbesten min ên klasîk derkevin.

Her wisa Xemgînê Remo, digel hevalê xwe M.Hemo, duwemîn pîrtûka ku ji helbesten zarokan pêk hatiye, bi navê "Civata Kuşlîkan" di sala 1994'an de çap kirîye. Temet ku ez dizanîm, helbestvanê me romanekê romanîvîsê tîrk Orhan Kemal ji, ji zimanê erebî wergerandîye bo zimanê kurdi, lê hîna nedaye çapê. Ji bîlî ristina helbestan û wergîranê, Xemgînê Remo, li ser zi-



manê kurdi, di her keys û delsveyê de dixebite û ji bo hinek govarêng kurdi, bi taybetî ji bo kovara 'Zanîn'ê kurteçîrok û helbestan xweş dimivise.

Helbestvanê kurd Xemgînê Remo, niha ji li Derbêsiya Binxetê binecîh e û berdewatm e li ser karê xwe yê taybet.

Bi hêviya berdewamkirina ristin û weşandina helbesten ciwan, digel daxwaza me ya serkeftinê bo helbestvanê kurd Xemgînê Remo, bi du helbest wî 'çivîkêng bendkirî' a ku ji bo zarokê pîroz ên Zagrosan hatiye darijin, ezê nivîsîna xwe bi dawî bînim.

Ü "Dayka min"

Lerizandin:
Wê gava ku awirén te
Li dergehê dilê min didan
Çend çivîkêng bendkirî
Bi tîrs jê hilfirîn û
Li resîşnorêng cavêng te
Lerizîn...
Wê gavê min nasi
Tê giyanê min ji dagîr kir

Ü di sehnîşîna laşê xwe de
Ez mam dil...

Ey talankaro;
Spî-deşta singa min
Bo te mérîg û çîmen in
Bi nazdarî,
Gul û biskojan bîn bike
Ü li ber simê hespê xwe
Berbad neke, talan neke...

Dayka min

Dayka min
Jiyana xwe tey de
Bûrand

Bi rondik û keseran,
Kincêng wê timî res in
Ji reng-jiyana wê ya res
Heger carekê
Kincêng spî li xwe ke
û rûgeş
Stranêng evîniyê
Bistirê

Ma wê ci bîbe?!



Vê hefteyê çalakiyên li navendê çandeyî ev in:
Li NÇM'ya Stenbolé

- 08.12.1996 **Yekşem:** Ji Teatra Jiyana Nû: Dewaya Generalê Teneke, saet: 17.30
- 11.12.1996 **Çarşem:** Gotübêj: Aslan Başer Kafaoğlu "Projeya GAP'ê", saet: 18.00
- 13.12.1996 **În:** Film: Heval (Arkadaş), Yılmaz Güney, saet: 18.00
- 14.12.1996 **Şemî:** Panel: Zagona Reveberiya Bajaran û Paketa Demokratîk bûnê, saet: 14.30
Konser: Koma Gulen Xerzan, saet: 17.30

- 15.12.1996 **Yekşem:** Konser: Bilgesu Erenus Li BEKSAV'ê çalakiyên vê hefteyê
- 08.12.1996 **Yekşem:** Pêşangeha Wêneyan: "Mirov bi mafêñ xwe mirov e", saet: 18.00
- 11.12.1996 **Çarşem:** Film: Tayfe-Seruven-Kont., Charlie Chaplin, saet: 18.00
- 13.12.1996 **În:** Film-Gotübêj: "Di siya tarî de" û sohbet bi Lale Mansur re. Seat: 18.00
- 14.12.1996 **Şemî:** Gotübêj: Helbest û Xelat. A. Yücel, M. Güzel, S. Sarıoğlu, M. Köz, saet: 15.00

RÜDAN

Generalê Teneke



Di perdeya sêyemîn de jî mijar zêdetir balkêş dibe. Gundî dadgehekê ava dîkin, şivan dibe hakim Generalê Teneke û leşke-rêñ wî dadirizînin, heta ji bo Generalê Teneke parêzerekî jî tîni-ne dadgehê ji bo ku darizandin bi edalet be.

Teatra Jiyana Nû van rojan lîstikeke ku Hüseyin Kaytan nîvîsiye bi navê "Daweya Generalê Teneke" li Navenda Çanda Mezopotamyayê derdixe ser dikê. Lîstik ji sê perdeyan pêk tê, li gorî perdeyan bikaranîna dekor, aksesuar û kostûman jî dewlemendiyekê dide lîstikê. Ew lîstika di sala 1993'an de habîbî lîstin, pişt re di sala 1994'an de jî ji bo kostûmê Generalê Teneke li NÇM'ê doz hate vekirin, ev doz hê jî didome.

Teatra Jiyana Nû jî di sala 1991'an de di bin banê NÇM'ê dest bi xebatê dîkin, pişt re di sala 1992'an de navê "Teatra Jiyana Nû" li xwe datşin. Berî çend mehan jî ji bo bîranîna Apê Mûsa bi navê "AP.." lîstike li dar xistin.

Ev lîstika dawî yanê "Daweya Generalê Teneke" bi kadroyeke pir berfireh tê lîstin, di her perdeyekê de çend lîstikvan cih digirin, di lîstikêde hem nûjenî hem jî bi nîrxên gelêri digel cih digirin. Li aliyekeş şivanek generalekê dadirizine, ji aliyekeş ve jî di firavînê de diçe pezêñ xwe didoşê. Perdeya destpêkê jîyanekê rojane ya ku kurd dijin nişan dide, her tişti ji rîzê ye, pişt re ku şivan bi gerîlayekî re dibe hevnas, îcar jiyana şivan hêdî hêdî diuguhere. Ew pêşî inasaneke cahil e, nîzane welatparêzî ci ye. Pişti ku gerîla jê re dibêje: "Tu welatparêz î" di jiyana wî û ya gundiyan de guherîn çêdibe. Di perdeya duyemîn de jî mijareke hîn cihê-reng hildidîne dest û ziman jî bi tirkî ye. Îcar ji ber ku têkiliyên gundiyan bi gerîlayan re çêbûne, leşker têne gund bi wê hatîne re Generalê Teneke jî dertê holê. Navê Generalê Teneke zêdetir bi kostu-

mên wî re dertê holê, li ser cilêñ wî yên leşkerî ji tenekeyan bigire heta logoyêñ rojnameyên tirk her cure nişan hene û ew "Radikal" e jî. Lê şexsiyeta wî ne teneke ye, zêdetir mirovekî nîjadperest e.

Di perdeya sêyemîn de jî mijar zêdetir balkêş dibe. Gundî dadgehekê ava dîkin, şivan dibe hakim û Generalê Teneke û leşkerê wî dadirizînin. Di wê perdeye de jî hin lîstikvan diuguherin. Gundiyêñ bêçek di destê wan de darek, Generalê Teneke tînine dadgehê. Dadgeh li navenda gund hatiye avakirin, heta ji bo Generalê Teneke parêzerekî jî tînine dadgehê ji bo ku darizandin bi edalet be.

Lîstik zêdetir mirovan dide kenandin. Her wiha hem di kostûman, hem di aksesuaran de dewlemendiyek heye û naverok jî xurt e. Li aliyê din lîstikvan jî pir baş rola xwe pêk tînin, psîkolojiya wê jîyanê pîr baş derdixine holê, divê herkes li vê şanoyê temaşe bike.

Li ser kîmasiyan jî mirov dikare van bibêje, zimanê kurdî hin kes pir mekanik bi kar tînin an ne rihet in an jî baş nîzannîn. Di perdeya duyemîn de bi zimanê tirkî tê axaftin yanê Generalê Teneke bi zimanê kurdî nîzane ji ber wê jî bi tirkî diaxive, di perdeya sêyemîn de jî bi kurdî diaxive. Ji bo lîstik zêdetir cidî be gelo Generalê Teneke nikaribû bi zimanê tirkî biaxiviya, an jî di perdeya duyemîn de bi kurdî biaxiviya? A dîn di jî di dema darizandinê de du heb şahid têñ li ser Generalê teneke şahidiyê didin, lê wisa xuya ye ku Generalê Teneke ji qal û belayê vir ve qetîfama kurdan pêk anîye.

M. AGIRI

TİŞK

ŞÜKRÜ GÜLMÜŞ



Dil-bombeyê gelê min

Zeynep Kınacı, navê xwe nû kir. Navê wê yî nû, bû Zîlan Xweşdiyan!.. Gava ku min, ew çalakiya Zîlanê bihîst, dilê min ji pêre teqîya. Ez ler izîm. Ez pejikmî. Bi Zîlanê re, ez firiyam. Her parçeyekî dilê min, bû pîzotek di nava dilê dijmin. Her perçê min hate ziman. Got: "Nebes e!.. Ew dijmin ji aştiyê, ji biratiyê, ji insanetiyyê fêhm nake. "Yek.. Dido.. Sisê Leyla!..". Lê min Leyla Kaplan bihîst. Dengekî mezîn da. Zîlan Dersim, Leyla Edene, Güler û Bermal Sêwaz!.. Ji Koçgirî, ji Zîlanê bigirin ta; Hizanê heta Fîzanê keçen kurdan bûn dil-bombeyê gelê min. Bûn tîrsa dilê dijmin, zelzela yîladekî nû, yê gelê Kurdistanê. Bi wan çalakiyên dîrokî ketin nav refîn şehîdan. Her tim bijîn kulîlkîn azadiya welatê min.

Ger, her mirovê kurd wan keçen kurd û wan çalakiyên wan ên mezîn bi bîrine. Li ser wan bifikire. Ka ji me re ci dibejin? Cara yekemîn ez, ji bo xwe bêjim: Pênuşa xwe bikim, emirberê dilê xwe. Ka cara yekemîn ew çalakî ji min re ci bi bîr tînin.

Ez, li dîroka însaniyêtê vejerim. Diçim noqta îsa. îsa, mîladek e. "Berî îsa", "Pişti îsa". Her mirov ji dê û bavekî tê dinê. Lê belê dayika herî mezîn û yekem, dayika tebîet e: Însan; ji hembêza tebîatê çêbû. Ew rîhberê bi navê "Însan"; li hemberî dayika xwe tebîetê derket. Diranê wê şikandin. Hefsar xiste stûyê wê. Pêşî însan serî hilda. Serhildan û berxwedan bû şexsiyeta însaniyeteke mezîn.

Berî mîlet û neteweyên qehreman; qehremanê wan gelan hene. Hêzîn karker hene. Di dîroka peşveçûna însaniyêtê da; her mirov, dizê agir Prometûs, daxwazvanê hilatina rojê, şerokê xulaman Spartakûs nas dike. Di nav însanîn mezîn de, di nav feylezofan de, Arîsto, Pisagor, Galîlo, Kopernîk, Bruno, İbn-î Rûst, Hallac-i Mansur, Kawayê Hesinkar bîr bînê. Jehr dane Arîsto. Wî mînâ şîr û şerbetê vexwar. Prometûs bi texta ve girêdan. Kezeba wî bi wawikan dan perçekirin. Bruno şewitandin. Hallac-i Mansûr, perçê perçê kirin. Pîrsultan bi-dar ve kirin. Lê tu car nedamet ji devêñ wan nehat bihîstîn.

Rûleta rusî, harakîriya japonî, duelloya însanîn birûmet yek bi yek derteketin holê. Pişti şerî cihanê yê duduian Kemikaze; xwe dîyarî kir. Di Rojhilata Navîn de filistîniyan gerîlayen intîxarî pêk anîn. İslâmî Cîhad û pir însanîn xwedî armanc canê xwe fedâ kirin. Ew pêgava yekemîn, çalakiya dîrokî û çîrîskîn şerîn azadiyê, bi Zîlanê li Dersîmî dest pê kir li Kurdistanê. Berî ku ew çalakî bîn holê Serokê Giştî yê PKK'ê A. Öcalan, ev diyar kir: "Her kurd êdî bûye bombeyekê..." Lê belê kesî guhê xwe neda wê bangê. Ger em hez bikin, an nekin, em rastiyê bibînin, an nebînin Abdullah Öcalan serokê PKK'ê ye û ew jî bi giraniya pêşengîya gelê Kurdistanê dike. Divê em bandora wê hesûdiya ramyarî betal bikin.

Îro ew çalakiyên ku dibin bi destpêka Kawayê Hemdemî Mazlum, Pîr Xeyrî, Ferhat û hevalîn wî dibin. Wan rê vekirin, Zekî ye û Rehşanê ala mî bi canê xwe hejîandin. Duh bi dehan, îro bi sedan, sibê bi hezaran însahîn me wê wan çalakiyan bikin. Dijmin bi xwe dilîze û dilerize, gelê kurd ger tu rabt. Şoreşa mezîn têyê bi pêk bînî. Dê rabe gelê min!..



Rovî û dîk

Dik û mirîşkan di gundekî de li gel hev jiyanke baş û xweş dibirin (dibûrandin). Di navwan de dîkekî bi aqil û têgihîştî hebû ku mirîşk û dîkilên din rûmeta wî digirtin û pîr pêwendîkarên wî bûn. Wî dîkî her dema dîkil û mirîşkên din dîtibûna, gazî wan dikir ku li ba hev rûnin û biaxîvin. Dîk digot:

— Werin da em ji tecrûbeyen yek û du iştifade bikin, ta ku em nekevin telkên rovî, tajî û wawikan.

Rojekê dîk ji lisê (ji Pîna) xwe derkevt û ji bo gerê çû deşte. Bihar bû, daran belgen xwe bişkivandibûn, bêhna gufan li hewa pir bû. Dîk ji wan rindahî û tazetiyan bi şewq hat û bi dengê bilind bang da.

Roviyekî ku nêzîkî lisê wî bû, gava dengê dîk bîhîst bi aliye wî ve çû ku wî bigire. Dîk gava rovî dît, pir da çû ser darê. Rovî mekar dît ku dîk ji destê wî derçû, nêzîkî darê bû û bi dengê bilind bang da.

— Axayê dîk, selam ji te re! Tu ji bo ci çûyî ser darê, qatî tu ji min ditirsî. Axir dijminatî di navbera me de nîn e. Çawa min dengê te bîhîst ez pir pê xweş bûm. Bibîne hewa çend baş e, deşte tev şîn e. Were, di vê hewaya hinde xweş de em hinekî bi hev re peyase bikin û tu bi wî dengê xwe yê xweş û şîrfîn bo min hinek stranan bibêje.

Dîkilê ku gelek çîrok li ser hîleyen rovî ji dostê xwe bîhîstibûn, zanî ku hîleyek penhan di nav van axafînan de heye. Got:

— Belê hewa xweş e. Deşt ji şînkahî ye û dengê min ji xirab nîn e. Lî ez te neniyasim (nas nakim). Ez hind dizanîm ku tu roviyek û divêt dîk li gel roviyan dostanîyê nekin. Rovî dijminê dîk û mirîşkan in.

Ez hind bi aqil im ku li gel dijminê xwe dostanîyê nekim. Rovî got:

— Te got dijmin? Dijmin kanê? Qatî te agah jê nîn e ku şer ferman daye û hemî sewal bûne dostê hev, divêt ci sewal azarê li gel ên din nekin. Vê gavê gurg û mih ligel hev dost in. Se ci kar bi rovî nîn e. Mirîşk li pişta tajî siwar dibe û li deşte digere. Ez sosretmayî me ku tu ji vê fermanê bê agah i.

Dema rovî ev gotin digotin, dîk gerdena xwe bîhîst kiribû û li rîka ku diçû gund mîze dikir. Rovî pîrsî:

— Tu li ku derê mîze dîk? Ci re tu guh nadî axafînen min? Dîk got:

— Sewalekê dibînim ku ji gund bi vî alî ve tê, nizanîm ci sewal e lê piçekê ji te mezintir, guhêne pehn hene û bi lez tê vî rexê me.

Rovî dema ku ev gotin bîhîstin axafînen li gel dîk û bi dest xwe xistina dîk hêla û reviya da ku erdeki tenha ji xwe re peyde bike.

Dîk dît ku rovî gelek tîrsîya, got:

— Tu dê bi ku de biçî? Sebir bike, da bibînîn ci heywan e dihêt. Belkî roviyek be. Rovî got:

— Ne xêr, ji nav û nişanîn ku te dayin kîfş e ku ew sewal se ye. Navbera me û seyan ne xweş e. Dîk got:

— Ma te nedigot êdî di navbera sewalan de dijminatî nemaye û hemî li gel hev dost in?! Roviye ku direvî got:

— Bo ci? Lî ez ditirsim ku wî seyî wekî te fermana şer nebihîstibe. (Azfa:3. rûp:48.49.50.)

BERHEVKAR: ABBAS ALKAN

Hemî bi hev re

Kotran (kevokan) bi azadî û şadî li ber asmanê avî perwaz didan û bi azadî û leyizan ber bi asmanê şîn ve lezzet dibirin. Pişti mudetekê, ji ber westana xwe li cem darekê sekinîn. Li derûdorê darê dendikê tehlî hebûn. Yekê ji kotran ew dendik dîtin. Hêdi çengen xwe vekirin û nêzîkî binê darê bû. Çend dendik (danîk) xwarin dendik taze û xoş, bi tam bûn. Li hevalen xwe kire gazi da ku ew ji van dendikê xoştam bixwin. Kotir hatin bin darê, li rexê (kinar) danîkan dadan û mijûlî berhevkirina dendikan bûn. Wextê baş têr bûyîn, yekê ji kotran xwe amadeyi fîrdanê kir, çengen (basken) xwe hilhejandin (dawesandin) da ku fir bide, lê nekarî bifire. Pê hesiya ku bi piyê (bi lingê) wê ve girêyek hêye. Kotrên din ji çeng hilhejandin da ku bifirin, lê bendikê dekê (telk, dav) piyên wan girtibûn û nedîkarin ji erdê bilind bibin.

Nêçirvanê ku di kozikê de bû, dengê çengen kotran bîhîst û bi xweşhalî (dilxweşî) ber bi wan ve bîlez hat.

Kotran zû-zû çengen xwe lêk didan, her yekê ji bo rizgariya xwe dikişand, lê çu (yek ji wan) ji ji erdê ranedibûn, disa diketin. Heryekî li koşê xwe benikê davikê radikir lê hêsta bilind nebûyî, disa dikevt. Kotra zana û hişyar ku navê wê Toqî bû got: “Geli hevalan, heq ew bû ku demâ me dendik dîtin, diviya bû me hîzir kiriba bê ka ci kesî ev dendik anîne. Ci-ra ev dendihîr taze û xoştam, rêtîne (rijandine) binê vê darê. Ger me hîzir kiriba, em nedikevtine kemînê. Niha ji, eger em kêmekê (piçekî) hîzra xwe (ramanâ xwe) bikin û hevkariya hev bikin, em dê karibin rîzgar bibin. Niha bêhnekê vedîn û gava we ferma min bîhîst, hemî li gel hev bi aliyeke de firbidin.”

Nêçirvan bi lez bi ber darê ve dihat, di vê navberê de Toqî ferma fîrdanê da. Kotran bi ferma wî re yekbar peren xwe vekirin û dek ji erdê rakirin û berhewa bûn, firîn.

Nêçirvan bo xwe got: “Di dawiyê de ev kotre dê westin û dê dadene erdê, ya baş ew e ku ez wan bîşopînim (li dûv wan biçim). Lî kotran hindî ku hêza xwe hîyî per vedîan û ji ber çavê nêçirvan windâbûn. Pişti çandekê li kinarê coyeke avê dadan erde.

Li ber kinarê coya avê hêlinâ, müşkekî hebû ku müşk ji kevn de dostê Toqî bû. Müşk di hêlinâ xwe de di xew de bû, ji dengê çengen kotran hişyar bû û ji hêlinâ xwe derkevtê derve. Gava müşk Toqî yê dos-tê xwe yê qedîm dît ku giriftarê (esir, dîl, gitî) telkîye (davê ye), ji ber birîna bendê (qeydê, davê). Toqî nêzîkî wî bû. Toqî got: “Dostê min, pêşiyê benda piyêñ hevalen min veke. Dilê min dixwaze ku yaranen min ji min zûtir azad bibin.

Müşk bi lez benda telkî cawî gitî û hemî benik parce parce kir kotr tevdî azad bûn û ji müşk re spaşkirin. Hîmek av vexwarin, paşê bi azad û şad ber bi asmanê şîn de firîn.

Dema ku kotran dubare azadiya xwe wergirtin, bi hev re bîryar dan ku êdi ci xeletiyen xwe dubare nekin ta ku nekevin dek û dolabê nêçirvanan û êdi neyên girtin...

BERHEVKAR: ABBAS ALKAN

Li ser wergera 'Biyanî'ya Camus

Fawaz Husên, bi şêweyek giştî di warê wergerê de bi ser ketiye û xwîner li taybetiyêñ zimanê jêwerger û lêwerger werdiqile. Ligel vê yekê di warê rêziman, vekît, teşeyêñ peyvan û devoka herêmî de tiştên beloq jî hene.

Klasikên edebiyatê yên cîhanê, ne bi awayekî lezgînî be jî li zimanê me têr wergerandin. Xwîner (xwendevan) jî bi zimanê xwe çêj û tehmê ji wan berhemêñ navdar distînin. Yek ji wan xwîneran jî ez im. Bêyî ku ez wan klasikan bi zimanekî din (wekî tirkî) bixwînin, pêşî ez bi zimanê xwe dixînim û bi vê yekê jî gelek şad dibim.

Di afirandina vê imkanê de pareke mezin a Weşanêñ Nûdemê heye. Ji bo nimûne, wê berhemêñ kesen bi nav û deng mîna Dostoyevsky, John Steinbeck, Çexov, Samuel Beckett bi kurdî weşandin. Her wiha romana hêja ya Albert Camus jî dîsa ji aliyê Nûdemê ve bi navê "Biyanî" hate çapkirin. Wergera wê ya ji fransizî jî, Fawaz Husêن kiriye.

Gava min ew xwend, min bala xwe bêhtir neda ser çawanibûna berhemê. Çimkî otoriteyêñ edebiyatê ji, zû de der barê wê de bîryara xwe dabûn. Jixwe Fawaz Husêن pêsekeke xweşik li ser danesina Camus, ji her hêlê ve, nivîsiye. Di derekê de wiha dibêje:

"Mirov dikare anuha ji xwe bipirsse çima ev pirtûka biçük wiqasî deng da û bi sed caran hat çap kirin

û wergerandin? Bêtîrî pêncî salî pişti derketina wê li weşanxaneya Galîmardê, ev pirtûka hêna bala rewşenbir û xwendevanan bi xurtî dikişine û hêna tê wergerandin. Cîma? (...) Cîma ew bûye berhemeke cihanî, geyti? Bersiv bêguman ê dirêj be lê mirov bi kurtî bibêje ku berdewama vê pirtûkê bêguman bi hunermendiya Camus û bî nêrînen yên wî li ser pirsa pûçiyê ve girêdayî ye. Her yek jî dikare rojekê ji rojan xwe di Meursault de bibîne."

Ê min dêhna min, di dema xwendinê de jî, li ser wergerê bû. Ma nayê gotin ku werger nîvî nivîse ye. Eger wisa be, nexwe em dikarin bibêjin ku di zimanê kurdî de şîrikê "Biyanî"ya Camus Fawaz Husên e! Ji ber vê çendê mijara wergerê ji min re girîng e û ez pûteyeke mezin bi vî kar û solî didim.

Fawaz Husên, bi şêweyekî giştî di wergerê de serketi ye. Wergereke delal kiriye, bêteredût dibêjîm ku yek ji wergerên hêja û têkûz e. Xwîner li taybetiyêñ zimanê jêwerger û lêwerger werdiqile. Eger em bi awayekî din bibêjin, bêhna zimanê jêwerger yanê fransizî ji xebatê tê. Ev jî tiştekî siruştu (tabiî) ye. Çimkî werger ne adabtekirin e. Zimanekî

Albert Camus

BIYANÎ



Biyanî, roman/108 rûpel
Weşanêñ Nûdemê

fambar, rewan derketiye holê. Gava mirov dixwîne, wekî agir bi pûş ketibe, a wisa xweş lê diçe.

Ligel vê yekê tiştên ku li xweşa me nehatin jî hene. Ew jî di warê rêziman, vekî yanê rastnîvis, teşeyêñ peyvan û devoka herêmî de xwe dîdine xuyakirin. Ha, em vê jî bibêjin ku hin hevok bi rastî beloq dîman û ez dihejandim, mînak: "Keysek wilo ketibû min" û "Nêrîna wan di min de ci bû?"

Em bînîn bîra xwe ku tiştê li xwîner deriyê berhemê vedike ziman e, ku ziman sivik, rewan û fambar be, naveroka wê ci dibe bila bibe, xwîner zû bi zû wê ji destê xwe dernâxe. Tenê ku di her warî de hevgirtinek hebe û xwêdaneke baş di ber de hatibe rijandin. Ji aliyê din ve, weşanxane jî di van karan de xwedî berpirsiyê ye. Mafê wê yê sererastkirina berhemê heye, wekî ji aliyê rêzimanî, vekît, standarta teşeyêñ peyvan ve.

ZANA FARQÎNÎ

nebûlatiyê germ, ji şerê cîhanê yê dûyemîn maye.

Piştî şerê mezin, Berlîn bûbû wekî kûmê ku di bin lingêñ zarokan de pelişi. Berlînê bi xezeba Xweda re pêşbazî kiribû û xwe di xwe de winda kiribû.

Heta girê dawîn ê ku li ser ala spî bêdaleqlandin bi erdê re rast be û heta tenê bi bêsûciya zarokêñ nezayî û kûcikêñ kuçeyan çok bidîn, bi agirê adeleta mirovahîye hatibû şûştin. Û ên ku ji şaristaniya cemidî mabûn; laşen mirovan ên bêaheng, girêñ hesin û polayê helandî.... Û wîcdane reş ê neteweyekê, ku ji hîcîrika labîrenta xwekujiyê hatibû rizgarkirin.

Bajar jî wek mirovan in. Îmajêñ wah, rûyêñ wan û sembolêñ wan hene, eş û şadiyêñ wan jî. Wekî mirovan, ên ku di şeran de winda dîbin hene, yêñ ku salêñ xwe, kuçeyêñ xwe, meydanêñ

Jiyana Rewşen

Kovara Navenda Çanda Mezopotamyê Jiyana Rewşen bi hejmara xwe ya sêyemîn derket pêşberî xwendevanan. Di vê hejmara kovarê de gelek nivîsîn cihêreg hene. Di berga pêşin a kovarê de wêneyê rewşenbirê kurd Osman Sebîr heye. Nijad Yaruk bi sernavê "Apê Osman Sebîr pir got û wek xwe got" balê dikişîne ser muhalifiya rewşenbirê hêja. Li aliyê din Feqe Husên Sağnîc pîrê helbesta kurdî ya klasik Melayê Cizîri bi me dide nasîn.


Di kovarê de nivîsa Zana Farqînî ya li ser "Navê stranan" hêjayî pesnê ye. Dîsa li ser Tungenyey nivîseke Adnan Alp balê dikişîne. Ji bîli nivîsîn ku me li jor qala wan kir, nivîsa - M. Zahir Kayan a bi navê Arzeba di vê hejmarê de jî didome. Her wiha Müslüm Yüçel bi navê "Gel, ne girdav in ku avê hilheçin!" Medeni Ayhan bi nivîsa xwe ya bi sernavê "Di çanda kevin de çêr, berzeqî û lênavkirin" dibin mîvanen vê hejmarâ Jiyana Rewşen.

Dîsa M. Zahir Kayan nivîsîn xwe yên di bin sernavê "Kakil" didomîne. Wekî navekî nû Cemil Denli bi nivîsa xwe "Ji bo ci romana kurdî pêşnakeve?" balê dikişîne. Her wiha vê di hejmara kovarê de çiroka Heşen Zinar "Rizgo" jî cih gitîye. Tekane nivîsa bi tirkî ya vê hejmarê jî, M. Zahir Kayan nivîsiye:



Gunehêñ bajarekî

FAYSAL DAĞLI



Berg di zimanê almanî de tê wateya çiya. Li vê paytexta Prûsyayê ya betilandî, gelek tax hene ku navê wan bi "berg" diqede. Lî tenê çiyayekî biçük heye li bajêr. Navê vî çiyayî Kreuzberg e, Kreuzberg hem çiya û hem jî taxek e. Bi kurdî; "çiyayê bixaç" e.

Ev çiya û ev tax li nav Berlînê ne. Lî Berlîn bajarekî li rastê ye. Bajar li ser erdekî rast hatiye avakirin. Yanê Kreuzberg vê paşiyê li Berlînê hatiye zêdekirin. Ev çiya ji dema nebûlatiyê rojgêranê nemaye, lê ji demeke bi qasî

xwe, ewladêñ xwe û evîndarêñ xwe winda dîkin hene.

Belê Berlîn xwediye wîndahiyê mezin e. Piştî şer ji bo ku bajarê ku xwe di bin xirabayêñ xwe de veşartibû, çareke din derxin hemberî rojê û jiyanê li cihê ku sekiniye careke din bîdomînin, jinêñ bajêr ên bêsiûd ên ku bêhnêñ xwe rizgar kirine, ketin heraketê. "Die Trümmerfran" yanê jinêñ xopanen destêñ xwe yên bi efsûn li Berlînê gerandin.

Û jinêñ xopanen; kirêj û zingara ku bi bombeyan ji vî bajarê gunehkar hatiye paqîjîkirin civandin. Jinêñ ku mîr û manewiyata xwe winda kirine, bi mil û piştîn xwe yên zirav laşen bajêr rakirin.

Miriyêñ Berlînê, Berlîna mirî li Kreuzberge veşartin. Gora bajêr, li ser tevî xaçekî mezin bilind bû.

Belê, gunehêñ Berlîn wekî çiyekî biçük mezin bûn.

Dijminê gunehkar

Kerek, dikek û kûçîkek hebûn. Ev her sê sewal ji neçarî, sefiltî û tunebûna xwarin û vexwarinê dev Tirkiyeyê ber didin, berê xwe didin welatekî din û diçin. Bi rê ve hinek mirov rastî van tê û ji wan re dibêjin.

— Ci hatiye serê we, hûn bi ku ve diçin, çima û ji bo çî? Hela ka derd û kûlên xwe bi bêjin ji me re. Kûçikê belen-gaz axîn dike û dibêje:

— Ji bo pariyek nan, ji sibê heya êvarê û ji êvarê heya sibê li ber gundan ez notirvan bûm. Niha jî Xwedê û pêxember jê ne razîbe dewleta tirk, her gundek kiriye cerdevan, wan jî nanê min xwar ji bo pereyan û ketin dewsa min.

Mirov dibêjin hela birayê dîk tu derdê xwe bêje, ka ci ye?

— Aaaaxx aaaxx ez jî nizanim ci bêjim, her roj li ber bangê min bang dida, gel ji xew hişyar dikir ji bo nimêjê. Bi vî awayî çend tene gotin bi destê min diketin. A niha jî di her gundekî de camiyek, melayek bi destê dijmin ava bûne û cihê min girtine. Mîna sêwiya ti, jar û birçî li ber dîwaran ez hiştim. Mirov bi kelegirî serê xwe dihêjînin û di bêjin:

— Birayê ker ka tu jî bi bêje xencera ser dilê te ji ci ye?

— Birayê delal du ker di welatekî de nabin. Ez û Silêmanê Desthesin emê cawa li hev bikin?!

MUHAMMED MAHMO

Heke zira te bê lotka min tê



Alif û pûta kerê diqede, xwediyê ker, wî berdide çolê, alifê deve ji diqede, xwediyê deve ji wî berdide çolê. Ker û deve hev dibînin, rewşa xwe jî hev re dibêjin, bi hev re dibin heval, diçin dikevine newaleke kûr hemû dar û giya û mîrg û kanî. Ker û deve ji hev re dibêjin. Îcar em ketin xêra

Xwedê, emê giyayê xweş bixwin û ava kaniya vexwin û di nav daran de razên. Çend meh wisa borandin, qelew bûn, pişta wan bû weki pişta masîyen deryayê. Rojekê ker ji deve re got: "Bi Xwedê birakê deve zira min tê." Deve gote ker: "Nebî nebî tu bizirî, mirov dengê te bibîzin, wê bêne me ji

xwe re bibin, wê baran li me bikin, bi rewşa me nelîze, em li vê newalê kêt dîkin." Ker bi gotina deve nekir û got: "Çare nîn e, ezê bizirim." Ker ziriya, karwanekî li nêzîki wan danîbû, çawa dengê kerî çû wan, hatin ker û deve gitin birin, barê xwe li pişta wan kirin. Ker gelekî qelew bûbû, nikarîbû bar bikişine, di bin bar de mexel hat. Rabûn barê ker jî li deveyê reben kirin. Qasekî din bi rê ve çûn, nav seqê ker xwendan da, careke din mexel hat, rabûn ker jî li pişta deve kirin, çendekî çûn, gîhiştin ser pireke bilind.

Deve ji xwe re got: "Vê carê ez tola xwe ji kerî bîstînim." Deve ji kerî re got: "Birakê ker bi Xwedê vêca lotka min tê." Kerî wiha li bin xwe nihêri, dîtku ci pireke bilind û çemekî kûr aveke xurt tê re dikiş, dike xupêxup. Kerî ji deve re got: "Birakê deve ez gorî te me, ez di bextê te de, tu lotka nede ez bikevim avê û dê av min bibe. Deve jê re got: "Birako ez ew qasî li ber te geriyam, min ji te re got, nezire, tu ziriya, yî.. Bi Xwedê birako, çilo zira te hat û tu ziryayı, lotka min jî hatiye, ezê bîme lotikan." Çawa deve da lotikan ker kete xwarê, nava avê û çû.

ABBAS İSMAIL

BIXELAT...



Bersiva Xacepirsa 43'an

Xacepirsa me bixelat e.

Di 15 rojan de ci bersiv
bigihîjin me, emê wan
binrixînin û bi riya pişkê li 5
kesan belav bikin. Xelata hej-
mara me ya 45'an pirtûka

Albert Camus
"BIYANI" ye.
Jérênot:

Ji bo ku bersiva we bê
nirxandin, divê hûn
"Peyva Veşarı" di nava qutiyê
li bin xacepirse de bintivîstîn û
tevi adresa xwe ji me re bisinin.


Albert Camus

BIYANI



Pênc kesen kû xelata xacepirsa hejmara 43'an, Pirtûka Jak London "Zaroka Şevê" qezencî kirine: Dîdar Döger/ Amed, Abdurahman Çelik/ İzmir, Nermin Yıldırım/ Mîrdin, Mahmut Şakar/ Amed, Noye Nedep/ Stenbol

XAÇEPIRSA BIXELAT (45)



PEYVA VEŞARI

düpişk

* Qellîma girtîgeha Diyarbekirê li derxî Meclisa TC'ye jî hot qebûlkirin.



Bila rexne nebe mexne

Li hin deverên kurdan peyvîn li dû hev tê gotin. Tipa "m" şûna tipa yeke-mîn a peyvî digire, di gel peyvî tê bilîvkirin. Mînak: Baxçeyan maxçevan, ziman miman,... Bi rastî bingeha wê ya rîzmanî heye û ev jî karê ziman zvan e ku wê şirove bikin. Min bi vê pêşgotinê xwest ku ez li ser rola rexneyan di jiyan gelan de rawestim. Her wiha min divê ez awayê rexneyan ku dikare bingehêن civakî, di hemû waran de xurt û ges bike, destnîsan bikim. Mebesta min ev e ku rexne, her tiştî bi awayekî zanistî şirove bike ji bo pêşvebinâbabetê rexnekirî, da ku berhem bêngînkirin bi kirar û naveroka xwe.

Rexne girîng e di jiyan me kurdan de, nemaze di warên wêjeyî, siyasi û abori de jî, da ku hesta gel firehtir bibe ji hêlekê ve û ji hêleke din ve jî xebat û karên rewşenbûr û siyasetvanan rast bibin û ew berdewam nekin li ser riyen xwe yên şas. Rexneya bêkin wê karibe rayeke giştî û şareza ava bîke, li dijî bîr û bawerî û gavên şas.

Nîqaşa ku bi nivîsa D.S Tizyanî dest pêkir, hişt ku ez li deriyê vê mijarê bixinim. Ew nivîsa ku Tizyanî nivîsibû di rojnameya Azadiya Welat, hejmara 35'an de û lêvegerandina Weşanxaneya "Avesta" di hejmara 36'an de, dema min dit, min fêm kir

Rast e, zevî û gulistanê edebiyeta kurdi tunin û ezmanê edebiyetê nivîs û berheman dixwaze ku tîna xwe têr bike. Lî li gorî bîr û bawerîya min, divê weşanê bêr derketin ne bi lez û bez bin. Divê berhemên giranbiha di ezmanê edebiyeta kurdi de bifirin û roniyeke zelal bidin cîhanê.

ku gufugoyek ne rast tê kirin, nemaze ji hêla berpîrsê Avestayê ve.

Min her du nivîsa Tizyanî de, min tiştîkî şas nedît ji bili mijara 'nebûna pirtûkê Evdila Pêşew', lewre çend berhevokê Pêşew hene. Nivîsa wî di warê danasına helbestvanê kurdê başûrî Pêşew û wergera helbesten wî de bû. Tizyanî çend rexneyen biçûk ji her du wergeran re (R.Keskin û B.Hebib) diyar kirine. Nivîsa Tizyanî ji riya dansinê û agahdarkirina xwendevanan derneketiye. Lî tiştî ez êşandim lêvegerandina Xwedîyê Avesta bû, wî bi hêrs gotinê xwe nivîstin û bi Rojnemeye Azadiya Welat rola çapemeniya kurd di rojîn îroyin de da nasîn û bêyî guhêñ xwe ji rexneyan re veke û bersivê bide û bi awayekî hosteyekî şas nake li dawiya nivîsa xwe got: Hinekî din mesûliyet!.... Hinekî din ciddiyet!....

Rast e, zevî û gulistanê edebiyeta kurdi tunin û ezmanê edebiyetê nivîs û berheman

mirim jî, ez dîsa bi mirovan vedidim. Tebîeta min ev e. Divê ez bi mirovan vedim."

Rewşa düpişk, dewleta tirk tîne bîra mirov. Di gel evqas hewlîn aştiyê ew hîn şer tercîh dike, rayedarê, dewletê ji bo şer dikarin welatê xwe jî bifiroşin.

Di dîrokê de bi qasî şah û padışahan, wezîr û sedrezam jî xwedî roleke mezin bûne. Hin car bi fîl û dafan padışah xistine bin bandora xwe. Ew xapandise, ji xwe re cih çekirine. İro Türkiye û dewletên împeryalist weki sadrezam û padışahan in. Lî di dîrokê de jî, iro jî ya ku bi ser ketiye desthilatdarf ye; dewletên împeryalist ên xwinrêj in.

Lî belê ew mafîn xwe diparêzin. Hemû politikayen xwe li gorî pêwistiyen sermaye çedîkin. Britanya ji çend bombe yên

dixwaze ku tîna xwe têr bike. Lî li gorî bîr û bawerîya min, divê weşanê bêr derketin ne bi lez û bez bin. Divê berhemên giranbiha di ezmanê edebiyeta kurdi de bifirin û roniyeke zelal bidin cîhanê.

Zor spas ji weşanxaneya Avesta û her kurdeki ku bi pêñusa xwe, bi zimanê zikmakî dipeyive, dinivise û diweşîne re, karê wan cihê serbilindî û pesnê ye. Lî weşanê bîlez û bez wê rî li ber nifşen nû re winda bikin. Weşanxaneya Ayesta hinek ji pirtûkên giranbuha weşandin Mînak: "Bîra Qederê" ya M. Uzun, "Ji Nav Şîrîn Min" ya S. Bîkes û "Mirî Ranazin" ya H. Usiv. Lî weşanxanê berhevokâ Birakuji ya A. Pêşew bîlez û bez dirxistiye. Hêviya min ew e ku sîngê me firehtir be jî rexneyan re. Ü rexnevan jî rexneyen xwe bi awayekî zanistî û bi dilekî berkefti li xwe bigirin. Bila rexne, bibe rexne, ne mexne!

ABÎDÎN KARDUXÎ

îrlandaniyan xof digire, pê re li dan û stan-dinê dike. Bi sistem rî ve diçîn. Tîrkiye bûye xerabeyek. Hawîrdor dirize: Gel di halê serdema navîn de ye. Ji avakirina xwe ta iro dewleta tirk bi fîl û dekan li ser piyan maye. Di bazara dînyayê de xwe rind firotiye. Li stûyê Yekîtiya Sovyetan siwar bûye, li stûyê NATO'yê siwar bûye. Van demê dawî bêhtir li Almanyayê siwar dibe. Lî negîhîştiye mebesta xwe. Deh sal e şer dike. Gelê kurd jî sedî nod di vî şerî de zirât dît. Lî daxwazên xwe jî di hilbijartina dawî de got. Bi kurtî dewlet dizane ku hêdî hêdî dimire, lî dîsa jî dibêje: "Şer û şer", dibe ku dewlet düpişk be, lî em ne beq in...

MENDO MOBAR

WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayincılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNIŞAN

Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
MEHMET GEMSİZ

Berpîrsê Karê
Nîvîsaran
(Yazi İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziyê
(Müessese Müdürü)
TAHIR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)
Nimînendeyê Giştî
yê Ewrâpâyê:
Mazhar Günbat

Suriye: Jan Dost
Helim Yusiv
963-21-960099
Berlin:
Süleyman Sido
49-30-69002695

Hannover:
Selim Biçük
49-5721-81360
Munchen:
Mahmut Gergerli
49-871-670884

Bruksel:
Medenî Ferho
32-02-466037
Stockholm:
Robin Rewşen
46-8-7510564

Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49
Celle:
Wezir Saçık
49 50 52 87 36

Düpişk

Düpişk ji beqê re dibêje: "Min ji çem derbasî hêla din bike". Beq dibêje: "Baweriya min bi te tune, tu dê bi min vedî". Düpişk dibêje: "Ez te bi vedim tuyê bimîri. Wê demê ezê jî bixeniqim". Ev gotin dikeve serê beqê, daxwaza wî dipejirîne. Düpişk li pişta beq suwar dibe û dikevin na-va avê. Di nîvî rî de şewatek ji paş stûyê beqê tê. Beq fêm dike. Ji düpişk re dibêje:

"Ma tu jî dê bimîri, te çîma bi min ve-da?" Düpişk dibêje: "Ez bizanim ku ezê bi-

Bila çavêن feleka xayîm kor bin

Ji berbanga sibehê heta 6'ê êvarê dixebeitin. Gişk ji Perwariya Sêrtê ne. Ew piştî salên 90'î ji welatê xwe veqetiyane. Ji dewlemendiyê ketine rewşa xizanî û penaberiyê, lê ji ber ku wan cerdevanî ango "bênamûsî" qebûl nekirine, serbilind in.

Xalê Remezan, xaleta Asiya, Ehmed, Zubeyde, Çiçek, Xelîl û Nasir... Temenê wan di navbera 12 û 55 salan de ye. Di avahiya 1500 m² yî ku derve û hundirê wê ne wekî hev in, di nava çopê de dişûxulin. Ji ber ku, avahî ji derve mîna qesr û qonaxê ye, lê hundirê wê ji bêhn û dûmanê diqilqile...

Ji berbanga sibehê heta 6'ê êvarê dixebeitin. Gişk ji Perwariya Sêrtê ne. Ew piştî salên 90'î ji welatê xwe veqetiyane. Ji dewlemendiyê ketine rewşa xizanî û penaberiyê, lê ji ber ku wan cerdevanî ango "bênamûsî" qebûl nekirine serbilind in.

Xebata ku dîkin, li Edeneyê û derdora wê wekî "xurdacîtî û eskîcîtî" tê binavkirin. Di van du-sê salên dawîn de "xurdacîtî" bi xebata kurdên "botanî" bûye sektoreke mezin. Bi sedan fabriqeyê bi vî cureyî hene ku iro bi hezaran kurdên feqîr û perîşan tê de dişixulin û nanê zarokêni xwe, "nano-ziko" be ji, ji vî karê eskîcîtî û çopçîtiyê derdixin.



Ji xebatkaran Remziye, ku zilamê wê, şehîdê doza welatê xwe ye, pîrsa me ya bi rengê "Hûn li vê derê karekî cawa dikin?" dibersivîne û wiha dibêje: "Em naiyolan, elemyonan, sariyan madeyê zêr ên giranbiha, paxir û hesinan, poşeten reş û spî yeko yeko ji hev cihê dikin, vediqetînîn." Piştre jî gazincê xwe yên ji aliye aborîyê tîne ziman. "Em serê sibehê heta êvarê 12 saet dişixulin lê yewmiya me 200 hezar lîra ye. Em pereyêni xwe ji, piştî 3-4 mehan distin." Hê wê

peyvîn xwe xelas nekiribûn ku xelata Asiya serê xwe ji ber koma naylonan bilind kir û qîriya; "Remzo! Bêje, bêje nexweşiyen me bêje, ma qey te kuxtekuxta me ya wan rojan ji bîr kir, kezîkurê?..."

Qîreqîra ku ji ber komika kamyonê tê bala me dikişîne ser xwe. Em dêhna xwe didinê ku, xalê Remezan bi boqîlîn (piyêni) Eliyê kebapçî girtiye û dikişîne, ba dide, difirkîne û Miz dide. Piş re em hîn dibin ku xalê Remezan cebarekî (qîrikçî) bi nav û deng e. Li gund dema dest û piyêni yekî ji cih derbiketa, xwe li ber deriyê mala xalê Remê didit. Remezanê Hecî Ehmet, xalê Remo rewşa xwe ya duh û iro di ber çavên xwe re derbas dike û wiha dibêje: "Bila çavên feleka xayîm kor bin, duh Botan ji min dihate pîrsin, iro ez di nava vê çopa genî de nexweş dikevîm, lê nikarîm herim ber deriyê doxtoran ji." Piş re bi hêstirê çavan peyvîn xwe didomîne: "Mam xulam! Bi heqê Xwedê! Heger bibêjin ceneñ heye li vê Edeneyâ xopan e, min vê cennetê navê. Ji ber ku axa vê derê bênamûs e. Li gund ji me yek kes dişixulî, deh kesan dixwar. Lî em li vê derê pênc kes dişixulin, disa ji em birçî ne. Keda vê derê ji heram e."

Beriya ku em xatir ji wan bixwazin, em ber bi sê xortênu ku li wir dixebeitin

diçin. Piştî 5-6 peyvan em hîn dibin kû derdê hevalê. Xelîl û Ehmed gelekî giran e. Bi Kurmanciyeke xerab derdên xwe dibêjin: "Malbatên me dixwazin ku me evlendinmîş bikin, lê di van şertan de em bimirin ji evlenmîş nabin. Heta em dönmişî vatanê xwe nebin, em evlenmîş nabin. Me herduran yemîn içmîş kiriye ku, bavêne me di vê yekê de israr bîke, eme wî oldırmış bikin..."

Nasirê 12 salî hênek û tinazên xwe bi kurdiya Xelîl û Ehmed dike.. Dixwaze hînek tiştan ji bibêje. Ji gundê xwe Tîfî (Okçular) yê ev 5 sal e ku derketiye. Dîyar dike ku wî zehf bêriya gundê xwe kiriye. Nasir, peyvîn xwe wiha didomîne: "Ez û hevalên xwe me li ser bêndearan dileyist, me li serê çiya kêt û seyran dikir. Me her dem xwe diavêt nava avâ serê kelê, carinâ me xiyar davêtin nava avê, ji ber ku av zehf cemidi bû, xiyar dibûn du seq." Béguman ji bo wan, iro û Xwedê qedand, nanê xwe yên iro ji derxistin, heta rojeke din Xwedê mezin e..

Belê; di fabriqeyâ kaxez û xurdayan de karkerêñ zarok û neviyêñ "Welatê Rojê", ku ev rojan di xewna xwe de jî bidîtana bawer nedikirin. Rojêñ wan bi vî awayî diborin lê disa ji wan bawerîya xwe winda nekirine, ev ji çavên wan, ji hereketen wan ji kîş dibin.

SALİHÊ KEVIRBİR

